


Tawanbar kî ye?



Wehdedînê Pasûrî:

Alîkanên Mamoste Beşikçi
niha li Çukurovayê ne

Rûpel 4

Dilbixwîn Dara:

“Helbestên Windabûyî”
li xwediye xwe ye rastîn digere

Rûpel 5

Hevpeyvîna Düzgün Deniz

Koma Agirê Jiyan:
Huner bi zorê çênabe

Rûpel 8-9

NAVEROK



6

Luqman Mehmûd: Helîm Yûsiv jînenîgariya me dinivîsîne



10

Dildar Şeko: Şabaş ji te re Cegerxwîn



11

Aynur Bozkurt: Dayikan negirîn!

Ji Xwendevanan

DERDÊ giran ji bo me bédewletî ye. Ev derd derdekî wisa ye ku bi zindiyên dikeve. Eger ew şer be dibe pisîk, gur be dibe kûçik, gereçî be dibe nîmîrov û dîz. Eger kurd be dibe "Allahun kûrosu, kuyruklu kûrt."

Ez diponijim gelo di dinyayê de neteweyeke din heye ku wisa dût pê ve hatiye kirin. Ey dijmin êdî em bi te hesiyane. Armanca te ew bû û her ew e ku tu me ji hejariyên me sar bikî. Lê heviya me heye, em dê wî dermanê tehl êdî li pişt çiyayê Medê vexwin û azad û bextewer bijîn heta bi hetayê.

ŞINASÎ ŞEN

ÎRO li welatê me şerekî qirêj didome. Di vî şerî de tu qezenca hêzên kedkar tune ye. Ev diravên ku di vî şerî de tîr xerckirin, divê tîketa beriya kedkaran.

Ew ciwanên ku di vî şerî de tîr kuştin ji zarokên kedkaran in. Çi ji vî alî û çî ji vî alî. Zarokên dewlemendan di vî şerî de dihê nagirin.

Şerê ku îroj tê domandin ji kedkaran re ji bilî xwînê, hêsrên çavan, xizani û birçîbûnê, tiştêk neaniye. Bêdengiya hêzên karker, karmend, gundî, pişekar û hwd. li dijî vî şerî hin bêhtir rijandina xwînê ye, birçîbûn e, pejirandina rijandina xwîna wan gîtlên ciwan e.

Îro şer û aşî du tîrêj in li pêşiya me ne. An emê bédeng bimînin, ku ev şer bi tevî rûyê xwe yî qirêjî bidome, an jî emê aşîyêke birûmet ji gelan tevan re bixwazin.

M. BEDRAN BÊNAV



Rewşa me

MEHMET GEMSİZ

Xwendevanên me yên hêja, me ji xwe re nekiriye kum ku em tim giliyên rewşa xwe ji we re bikin. Ne em ji rewşa xwe dipûkînin û ne jî digazînin. Ev rewşa xerab beriya me jî hebû û vegavê jî berdeham e.

Li vî welatî û heta li vî cografyaya ku em lê dijîn, bi gotinê tu tişt hel nabe. Lewma "keç û kurên bavan" dest hilanîne û ji bo guhartina rewşê têdikoşin.

Ev tîkoşînek e û her kes di cih û warê xwe de çalakiyê dike. Em jî di warê xwe de li hemberî vî pergala çewşîner tîkoşînekê didin.

Hin caran be jî em xwe berpîrs dibînin ku der barê rewşa xwe de raporekê pêşkêşî we bikin.

Bêyî ku em dirêj bikin-hema em bibêjîn, ji aliyê tirajê ve halê me ne baş e. Sedema vî yekê jî helwesta romê ye.

Çi bi awayê rasterê û çî jî nerasterê, tehde û pêkutiyên wê li ser me hene. Lê bi piranî jî bi awayê nerasterê bi ser me de tîr. Em jî nikarin bi şeweyekê fermî dozê li wan bikin. Ev yek bêhtir di warê firotan û belavkirinê de diqewime.

Em rojnameya xwe hem bi şîrketa belavkirinê (BIRYAY Dağıtım) û hem jî bi destan belay dikin. Hêzên dewletê rê li pêşiya her du rîyan jî digirin û nahêlin hem bayî û hem jî belavkarên me rojnameyê bigihînin xwendevanan.

Gefan li wan dixwin, dest datînin ser rojnameyên di destê belavkarên me de, li wan dixin, rojnameyan çîr û berçîrî dikin.

Gelek deverên ku em nikarin xwe bigihînin wan hene. Hema bibêjîn welatê me jî Azadiya Welat mehrûm e. Em dixwazin bi îmkânên xwe weşana xwe bişînin wan deveran, lê polis dibîne asteng û gefan li wan kesan dixwin ku tîkiliya xwe bi rojnameyê nekin.

Ji bo vî yekê em nîmûneyekê bidin. Me bi rîya Aras Kargoyê rojname dişandin Wanê, da ku ji aliyê nûnerê me ve li wir bi destan bê belavkirin, lê polis mudahale dikin û şîrketê îqaz dikin ku careke din weşana qedexê (yasak yayın) qebûl nekin.

Belê, mûameleya "weşana qedexê" bi rojnameya me tê kirin!

Ne tenê belavkar bayî jî dibin armançên cerdên polîsan. Ji firotina rojnameya

me re dibîne asteng. Digel vî, xwendevanên me jî ji vî rewşê bêpar namînin. Gef li wan jî tê xwarin, ew jî tîr tirsandin.

Rojnameya me jî wekî gelek weşanên dijberî pergala di ekranên televîzyonê de mîna "hêmana sûc" tê nîşandan.

Armanca pergala çewşîner eşkere ye. Bi van helwestên xwe dixwaze weşanê bike-tengasiyê. Hem dixwaze weşanê ji aliyê aborî ve bişîhîne û hem jî dixwaze gel ji weşanên bi kurdî dût bixe.

Tîkiliya rojname û xwendevanan qut bike.

Ji aliyê din ve jî, ne dixwaze weşanê bi kurdî bimirin û ne jî bijîn. Çimkî hebûna wan di warê dîplomatk û tîkiliyên siyasî de, nemaze di qadên navneteweyî de, bi kêrî pergala kemalî ya stemkar tê.

Bi weşîteya sazîyên sîvil namilkeyan (broşûran) derdixe ku li Tirkiyeyê zîmanê kurdî serbest e û pê kovar, rojname, pirtûk... û kaset tîr derxistin. Yek ji wan sazîyan jî "Türk Demokrasi Vakfı" (Weqfa Demokrasiyê ya Tirk) ye.

Çaxa ku heyetên welatên biyan tê serdana me, tavilê vî bersivê didine me: "Hûn dibêjin zîmanê kurdî ne serbest e, lê va ye hûn bi kurdî weşanê dikin."

Belê, wîsan e, lê di qanûnan de ne serbestî û ne jî qedexekirina zîmanê me eşkerekirî ye.

Aha ev e rewşa me û roma reş.

Dewleta tirk zê xozo dirbetino

YAŞAR İNCE

Dewleta tirk se sero welatê ma di gûn rijeno. Sera 1980'î Kurdistanê tedir mîletê ma kerdibi zîdana. Zê xozê do dirbetin ame bi ambazane partî ser mexsedê eyî Kurdistanê Zîdananê Amedê şexstê ambazone partîdi biqedino; îxanet, xayînteyî vîstî miyandî mîletê ma. Nêşayê çîye bikeroneyî vero sera 1982 aşîniya Newroz di M.Doğan verê zulmê dujminî di xwi kerd agirê Newroz, pey ra ambazeci Ferhat Kurtay û bi hîri ambazane xwi veşnayî. Zîlm û qatîlamê dijminê tirk neya nêvindert. Enê wahşetî dijminê tirk vero narayî serêy M. Hayri Durmuş, Kemal Pir, Ali Çiçek, Akif Yılmaz sara 1982'di kewtî veşaneya mergî. Enê ambazan qandê welatê xwi yê dijminî vero, serêyî xwi warznayê û bi şehîd. Serokên kurdan ganê xwi dijminî vero, kerdî tîfing û vero vindertî û dijmin neşay Amed bîfno û hema zî nêvîsto.

Sara 1984'di şerê azadî dest bi şerê çekdarî kerd. We roj ra heya ewro dewleta tirk bi leşkerî, bi dîpyomasîyê, bi aboriyê xwi û hîna dewletê dagirkarana tedir alîkarî dewletî tirk kerd, reyna zî nêşina şerê partî vero nêşkan vîndiro. Xenzîrê kuyî sero wexto dirbetin bo, nêvano daro, nêvano tebayo, nêvano qîço, nêvano kalo çî teba bêro civera êrîşê serdê ci keno. Dewleta tirk zî ewro biyo zê xenzîro dirbetin. Şerê azadî ma

Şerê Çekdarî ma vînenê heme ca di dek û dolavên dijminî vecen werte. Reyna (fina) dewleta tirk zê xozê do dirbetin narayî tedir darê ma, koyê ma, dewê ma bi tanqanê xwi, bi teyaranê xwi, her roj ma vînen o mîletê ma qetil keno, koçber keno, sîrf qandê gerîlayê vero nêşeno xwi bigero.

vînenê ewro amayo merhelênde zahf gird. Hêlê eskerî ra, siyasî, dîplomasi, sazûmanê xwi tedir her ca di xurt kerd.

Şerê Çekdarî ma vînenê heme ca di dek û dolavên dijminî vecen werte. Reyna (fina) dewleta tirk zê xozê do dirbetin narayî tedir darê ma, koyê ma, dewê ma bi tanqanê xwi, bi teyaranê xwi, her roj ma vînen o mîletê ma qetil keno, koçber keno, sîrf qandê gerîlayê vero nêşeno xwi bigero. Gerîla Kurdistanê Başur di, o Bakurdi welatên do azad keno virazo, gerîla veciyayo. Narayî nêwazenê gerîla dekoy welatên tirk. Co ki ma vînenê ena dewleta tirk zê xozê do dirbetin bi namedî îslamiya bi destê RP'ya ma vînenê Kurdistan di o Tirkiyê di o di zîdana di şoreşkerên tirk, welatparêzan qetil kenê.

Ana gûnî hama wuşk nêbîbî ma vînenê eno dewletê tirk bi destê îslamo sexteya gûniya welatparêzan narayî Zîdananê Amed di rijnê. Zeredê di aşîyan di gerîla dewleta tirk rê êrîşo gird qarqolanê ci rê, zerêyî sîkandi ci rê rehetey nêmendo. Nêy ver ra dewleta tirk zê xozê do dirbetin ma vînenê ewro zîdananê Amedî de 24 rezberîdi embazê ma

yê bêtîfing, dijminî bi tanqanê xwiya, bi topanê xwiya 11 ambazanê ma bi asîna, bi çîwana tîfingana serêy ambazanê ma mezgyanê (mejî) ma tedir vila kerdî, 30 ambazî dirbetinê giran ê. Eney vero zîdananê tirkandîr ê welatparêzî hember wahşetî dewletê tirkî protesto kerdin. 3 ambazan Stenbol Bayrampaşa hepsa ci di ambazanda keyek o 2 heb ambazê laceka wahşetî dewleta tirk protesto kerdî o xwi veşnayî.

O ki xwi rê vano ez insan a, ez demokrat a, ez şoreger a, ez welatparêza eno zîlmê dijminê vero gero nêvîndero. Ewro wahşetê ma kurdan sero esto, ma kurdan rê xebatêndo zahf gird kawno. Serokê şerê azadiya ma, vengû ma dayê, o ki bi canê xwi, o ki bi malê xwi ve pîro piya xwi hêr ra, o eno seferberîyo vendayo kê destra çî yeno o qandê xafîrêdê şehîdana, qandê welatê maya wa xebat bikero, wa goşin bidono seferberî. Eno firseto ki kewto ma dest, ano firset ma nêrevnê, ma vera welatêndo azad, mayê şîna qandê nê welatiya. Enê xozî dewletê tirk vero ma tedir destê xwi, mîlê xwi ma bidî pê û nê dijminê vero vindere. Ancax ma welatê xwi azad bikere.



QEDEXYA li ser Studyoya MED-TV a li Brukselê rabû, lê bikaranîna arşivê hê jî qedexe ye. Studyoya MED-TV ya ku roja 19'ê rezberê bi destê cendirmeyên belçikî hatibû morkirin, roja 21'ê kewçêrê jî nû ve hate vekirin. Li gorî daxuyaniya rayedarên MED-TV cendirmeyên belçikî di cerda xwe de zirareke mezin gihandine studyoyê, lewre jî ewê ji bo tazmînkirina zirara xwe, serî li dadgehê bidin. Dîsa li gorî gotina berpirsên MED-TV'yê, dewleta belçikî dixwaze rê li ber çûn-hatîna welatparêzan bigire, lewre jî hin şert û mercan datîne ber rayedarên televizyonê. Lê wan diyar kir ku ewê van şertan nepejirînin.



RÛXSTINA Efûyê ya Navneteweyî (AI) roja şemiyê (26'ê kewçêrê) li seranserê cihanê ji bo protestokirina kirinên dewleta tirk ên li dijî mafên mirovan, çalakiyên rûniştinê li dar dibê. Tê gotin ku ev çalakiyê bi taybetî wê li welatên wekî Fransa, Norwêç, Avûsturya û Almanyayê pêk were. Her wiha ji ber ku ev çalakiyê rastî "Roja Windahiyan Cihanê" tê, wê 20 endamên rêxistinê beşdarî çalakiya malbatên windahiyan bibin. Dîsa nûnerên AI'yê wê di eynî rojê de li Otele Richmondê çalakiya çapemeniyê li dar bixin û der barê kampanyaya li hemberî Tirkîyeyê de agahiyan bidin.

NÛÇE

Tawanbar kî ye?

DIK

Agirbesta bi kotekî

Hêzên başûrî li aliyekî bi riya Amerîkayê dan û standina aştîyê dikin, li aliyê din jî şerekî tund li hemberî hev dimeşînin, da ku zehftir herêman bi dest bixin. Hefteya çûyî pêşî roja 21'ê kewçêrê Serokê PDK'ê Mesûd Barzanî li Silopiyê bi Cîgirê Sekreterê Dewletê yê Amerîkayê Robert Pelletreau re hevdiîtin çêkir, roja din îcar Celal Talabânî hat bi Wezîra Karê Derve yê Tirkîyeyê Tansu Çiller û Robert Pelletreau re hevdiîtin çêkirin.

Mam Celal, piştî ku Xanim Çiller ziyaret kir, dîsa qala parastina sînoran kir.

Amerîkaya ku berî çendekê li herêmê însiyatîfa xwe wînda kiribû, niha dixwaze bi pêkanîna agirbestekê, dîsa herêmê bixe bin bandora xwe. Li gorî agahiyan piştî agirbestê wê Amerîka li herêmê baregeheke leşkerî ava bike. Dîsa niha pisporên amerîkî, dixwazin ku Amerîka dev ji parastina yekparetiya erdê Iraqê berde.

Dewleta tirk jî wekî her car jî Amerîkayê re bûye pir, di ber re jî cat dike ku hin daxwazên xwe pêk bîne. Dîsa hin nivîskarên tirk didin zanîn ku tiliya Tirkîyeyê jî di şerê navbera PDK û YNK'ê de hebûye. Li gorî kesên ku vê yekê dibêjin, dewleta tirk bi tûjkirina PDK'ê li hemberî YNK'ê, xwestiyê rê li ber hewlên ji bo dewleteke kurdî bigirin.

Hêjayî gotinê ye ku dewleta tirk hê jî dev ji doza avakirina herêma tampon bernedaye. Her wiha tê gotin ku hem dewleta tirk û hem jî Amerîka dixwazin PDK'ê û YNK'ê bajon şer hêzên ARGK'ê.

YNK û PDK'ê guhên xwe ji hemû bangên hêzên welatparêz re girtin. Lê piştî hevdiîtinên bi Pelletreau re, qala agirbestê tê kirin, nediyar e ku wê agirbesteke bi kotekî kengê pêk were û heta kengê bidome.

S. TAN

Tirkîyeyê bi girtin û cezakirina rewşenbîrên xwe yê wêkî İsmail Beşikçi, Işık Yurtçu, Ayşe Zarakolu, Yaşar Kemal... qîma xwe neanî, îcar çav berdaye

rewşenbîrên biyan û dixwaze wan jî bixe piştî caxên hesinî.

Yaşar Kemal li dadgehê dema ceza lê hatibû birin, wiha deng li heyetê kiribû: "Ez we mehkûm dikim."

Di nav hefteya ku derbas bû de, Wezîra Karê Derve Tansu Çillerê civîneke çapemeniyê çêkir û diyar kir ku wê di warê mafên mirovan de Tirkîyeyê bigihînine welatên herî demokrat. Lê, digel vê daxuyaniyê, di nav vê hefteyê de bûyerên wisa qewimîn ku bi taybetî mirovên aştîxwaz û rewşenbîrên vî welatî nizanin bikenin an bigirin... Hinek rewşenbîr li ser diyarkirina fikrên xwe û ji ber nivîsên xwe hatin girtin, hinekan ceza xwar û ji bo ku werin li mehkemeyê îfade bidin DGM'ê bangî 144 nivîskarên dinyayê kir.

Hunermend û aştîxwazê navdar Şanar Yurdatapan hate girtin. Ji bo girtina wî du sebeb hatin diyarkirin: Çêkirina programeke bi navê "Kurşun-Kalem" jî MED TV'yê re û şermezekirina sîfîkasta li dijî Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan. Hunermend Yurdatapan bi munasebeta aştîxwaziyê û ji bo ku peşk li agirbestê nekeve, tevî hinek rewşenbîran îlana şermezekirina sîfîkasta li dijî Abdullah Öcalan imze kiribû.

Li gorî ku hiqûqzan diyar dikin, her çendî Abdullah Öcalan di çavê dewletê de "sûcdar"ekî mezin jî be, li gorî mîzîna hiqûqê sîfîkasta li dijî wî bi xwe sîfîkasta mezin e, ji ber ku mafê kesî tune ku kesî bêmehkemekirin bikuje. Yanê şermezekirina sîfîkastê ne sîfîkasta sîfîkast bi xwe ye. Ji aliyê din ve Şanar Yurdatapan diyar kir ku ji bo MED TV'yê tu program çênekirine, tenê pêşkêşîya programa "Kurşun-Kalem"ê kiriyê û binê vî îddiyê tune ye.

Wekî ku tê zanîn, Şanar Yurdatapan berdevkê "Ji bo Aştîyê bi hev re" û yê têkoşîna "Li dijî sîfîkariya ramanan" bû. Aştîxwaz diyar dikin ku di rastiya

xwe de Şanar Yurdatapan li ser kar û xebatên xwe yê ji bo aştîyê hatiye girtin. Rojnamevan-nivîskar Ragıp Duran jî, li ser hevpeyvîneke xwe bi deh meh hepis hate cezakirin. Ragıp Duran, bi Serokê Giştî yê PKK'ê re hevpeyvîn kiribû. Tişteki balkêş e ku Abdullah Öcalan bi xwe li ser vî hevpeyvînê beraat kiriyê. İddiaya mehkemeyê ew e ku Duran propaganda kiriyê. Ragıp Duran dibêje ku ev îddiya ji aliyê meslekî ve ji bo wî heqaret e...

Nivîskarê navdar Yaşar Kemal jî, li ser nivîseke xwe bi salek û şeş mehan hatibû cezakirin. Ev ceza jî, ji aliyê Mehkemeya Bilind (Yargıtay) ve hate pejirandin. Cezayê Yaşar Kemal pênc sal tecil kirin, yanê ku di nav pênc salan de ew "sûc"ekî din bike, vî cezayî jî bi yê nû re wê pê bidine kişandin.

Ji ber ku rojnamevan Reha Mağden bi nivîskar-lêkolîvan Altan Tan re hevpeyvînek kiribû û ev hevpeyvîn di kovara Aktüelê de hatibû weşandin, Berpirsê Karê Nivîsaran ê Aktüelê yê wê demê Alper Gümüş hate girtin. Gümüş bi pênc meh hepis hatiye cezakirin. Li ser vî girtinê Reha Mağden di rojnameya Radikalê de nivîsek bi sernavê "Min nivîsand, Alper kete hepsê" nivîsand û reaksiyona xwe wiha diyar kir: "Bêsiûdiya vî welatî ya herî mezin ew e ku, her dem hêvî mîna "sûc"ekî



hatiye tarîfkirin." Ji ber ku kitêbeke bi navê "Ji bo raman azadî" hatibû weşandin û tevî 1080 rewşenbîrên Tirkîyeyê, 144 nivîskarên dinyayê jî, wekî weşankarê vî kitêbê xwe eşkere kiribûn, Dadgeha Ewlekariya Dewletê jî polîsan ji bo mehkemekirinê daxwaza girtina van nivîskarên dinyayê kir. Li ser vî yekê hinek mirov dipirsîn: Ku ev nivîskarên navdar ji her welatên dinyayê rabin, werin, wê dewlet çi bike? Gelo wê wan jî bigire biavêje hepsê?

Ev jî pêkeniya dadgehî ye, pêkeniya dewletê ye...

Li hêla dinê, berdevkê "Platforma Azadî û Mafan" Oya Gökbayrak ku ji herdu piyên xwe ve seqet e, hate girtin. Polîsan diyar kir ku di kursiya wê ya biteker de 17 gram eroîn hatiye girtin.

Oya Gökbayrak jî eşkere dîke ku ev komployeke polîsan e û ev komplo li ser têkoşîna wê ya aştîxwaziyê hatiye serê wê. Û bi taybetî jî li ser têkoşîna wê ya ji bo piştgirîya dayikên windabûyan...

RAHMI BATUR

Alîkanên Mamoste Beşikçi niha li Çukurovayê ne

Hêzên dewletê gelek ji me kuştin, gelek ji me girtin. Ji ber zilm û zora dagirkeran em ketin bajarên xerîb. Niha em li vir jî sewalan xweyî dikin, me dev ji koçeriya xwe berneda. Ez mirovekî koçer im, ji Eşîra Alîkan im, niha di Çukurovayê de dijîm. Ji 300 malbatî zêdetir ji eşîra me li Osmaniye, Edene, Sîlîfke û Mêrsînê belav bûne. Ew tev ji ber zilm û zora dewletê revîn.

Gava behsa koçeriyê dibe Kurdistan tê hişê mirov, lê belê îro koçerî ne tenê li Kurdistanê, li Çukurovayê jî heye. Ji bo çî koçer deh, pazdeh sal berê li Kurdistanê bûn, lê niha ketine Deşa Çukurovayê? Sedema wê kurdîtiya wan e; ji bo ew jî beşek ji gelê kurd in, tevî gelê xwe ji ber zilm û zora dijmin ji welatê xwe derketin.

Bi rastî warê koçeran tune, ew geh li vir in geh li wir in, lê her tim li Kurdistanê bûn. Qet nedihat bîra wan ku ewê rojekê, dev ji jiyana xwe ya azad berdin, bêyî xwesteka xwe ewê berê xwe bidin welatekî din. Lê derketin ji welatê xwe. Jê bûn, ji av û axa xwe bûn. Tevî vê yekê jî ji koçeriya xwe nebûn, koçeriya xwe bernedan. Li hemberî dewletê, wan tu caran serê xwe netewand, her tim li hemberî kedxwaran rabûn.

Êdî ew, war bi war nedigeriyan, jiyaneke zor li benda wan bû. Ew rastî her cure xizanî, belengazî û nezaniyê hatin. Da bikaribin li welatê xelkê jiyana xwe berdewam bikin, di her warê jiyane de guhartin diviya çêbibin, di pêvajoya vê guhartinê de, civakek ji çanda xwe ya berê dûr, tevlihev dihat holê.

Em çûn cem wan, me li ser cudatiya di navbera jiyana welat û bajarên tirkan de di gel wan sohbet kir. Em rastî Xalê Simaîl hatin, ew zilamekî 40 salî ye û ew bi me re li ser jiyana koçeriyê axivî:

“Jiyana koçerîtiya berê jiyana gerê bû, bihar û havînan em diçûn zozanan. Em diçûn cihê bilind. Cihê ku em diçûne tev keviyê berfê bûn. Li wir jiyana pir hêsan bû, şivan di nav pez de bûn tim rihet bûn û li malên xwe bûn. Lê zivistanan dema dinya dicemidî em li wan zozanên jorîn, wekî Sîpanê Xelatê, Xerzan, Meleto, wekî Kurê Ziyaret û Çiravê bûn.

Ez dikarim navê bi sedan zozanên koçeran bibêjim. Hinekên wan zozanan ên koçeran bûn, hinek jî yên gundiyan



Koçerên ku hînî cihê bilind û hewayaya wan deran bûbûn, ji ber şerê qirêjî û pêkûtiya roma reş neçar man ku ji wan cihan bar bikin û berê xwe bidin cihanê xerîb. Di wêne de koçerên li dora Çiyayê Agiriyê tene dîtin.

wan deran bûn, me koda wan dida. Dema dinya dicemidî em dihatin cihên wekî Bamerd, Qelacê, Nisêbînê û dora Cizîrê.

Jiyana koçeriyê jiyaneke azad bû, em ne di bin bandora tu kesî de bûn, heta vê cara dawiyê PKK çêbû, dewleta dagirker digot: ‘Hûn PKK’ê xwedî dikin, tim alîkariya wan hûn koçer dikin’.

Ji ber wê, ew zozanên me yê ew qas xweş û bilind li me qedexa kirin. Dema çûna zozan hate qedexekirin, me nikarîbû êdî sewal xweyî bikira, em mecbûr bûn, me dev ji welatê xwe berda. Hêzên dewletê gelek ji me kuştin, gelek ji me girtin.

Ji ber zilm û zorê em ketin bajarên xerîb. Em li vir jî sewalan xweyî dikin, me dev ji koçeriya xwe berneda. Ez mirovekî koçer im, ji Eşîra Alîkan im, niha di Çukurovayê de dijîm, ji 300 malbatî zêdetir ji eşîra me li Osmaniye, Edene, Sîlîfke û Mêrsînê belav bûne. Ew tev ji ber zilm û zora dewletê revîn.

Lê dewlet li vir jî nahêle em sewalan xweyî bikin; her roj êrîş dikin ser gomên me, gomên me xera dikin û dibêjin: ‘Hûn ji ku hatin, dîsa herin wir.’

Em jî zanin ku wekî xelkê welatekî meyî azad hebûya, em nediketin vê rewşê, emê biçûna welatê xwe. Jiyana me ya jêr ne tu jiyana e, welatekî germ, mêşên wê pir in. Welatekî me yî azad hebûya emê biçûna ber wan belekiyê berfê war û zozanên xweş.”

Belê, eşîra ku Mamoste Beşikçi, li serê lêgerîn û lêkolînên xwe çêkiribûn, ji neçarî dev ji cih û warên xwe berdabûn û hatibûn Çukurovayê.

Leşkeran em dişelandin

Xalê Simaîl li ser tēkiliyên di navbera koçer û dewletê de wiha dibêje: “Koçer tu caran di bin tesîra dewletê de neman, ji sedî pênciyê wan ji dewletê re leşkerî nedikirin. Ji bona wê yekê dewletê zehf zor û zilm li ser me dimeşand. Leşker dihatin gavanek, şivanek, rêwiyek bidîtana lêdidan. Ew dişelandin, tiştê wan ên hêja ji wan distandin. Dema leşker dihatin nav me, pîrekan dest diavêtin daran, lê didan ji nav malan derdixistin.

Gelek tiştên din hebûn me û wan gundiya digirt şer diçûn cem dewletê giliyê me dikirin, digotin ku wan leşkerî nekirine.

30 sal berê bavê Kamûran İnan Şêx Silhedîn, wê demê Qeymeqamê Bedlîsê bû, wî û dewletê êrîş anîn ser koçeran, li cihê ku niha Hîzanê ye; Mila Mîr Celadîn jê re dibêjin. Ew jî zozaneke koçeran e, di vê êrîşê de wan 18 kesên me kuştin. Di gelek cihan de kuştin û talanî çêbûn. Ji bona ku koçer asimilê nebûn, tu carî ji ber ku em bi dewletê ve girêdayî nemane, tēkiliya koçeran û dewletê her tim xerab bûye û em zêde neçûne dibistanên dewletê...”

Emê li zimanê xwe xwedî derkevin

Ew li ser kurmanciya koçeran jî van tiştan dibêje: “Ez niha dikarim bi her çar hêlên Kurdistanê re bi kurmancî biaxivim. Kurmanciya me ji bav û pîrên me maye. Em jî zarokên me jî li metropolan bin, li deşt û zozanan bin emê lê xwedî derkevin. Ewê zarokên me jî lê xwedî derkevin.”

Xalê Simaîl li ser pîrsa me dide zanîna ku dema şerê qirêjî biqede, rojekê li Çukurovayê namînin û wiha didomîne: “Li gorî min ev şerê gemar were rawestandin, em rojekê li van deran nasekinin. Emê careke din herin ser war û axa bav û kalên xwe.

Ji bo rawestandina şerê gemarî bi dil û canê xwe û bi xwîna xwe em amade ne. Em li hemberî dewleta dagirker, em li dijî wê sekinîne...”

Xalê Simaîl bi vî rengî dawî li axaftîna xwe tîne:

“Ew şerê ku tê dayîn, şerê mirovatiyê ye, ji bo mafên mirovahiyê, ji bona azadî û serxwebûnê ye. Li gorî dîtina min koçeran tēkoşina neteweyî daye, cihê xwe li pêşiyê girtine. Serokê Neteweyî “Cihê ku koçer hebin, ne hewceyî nobetê ye” gotibû. Ji ber ku xerabî ji koçeran çênebûye. Banga min ji tevê koçeran û tevê gelê kurd re ev e; li doza xwe xwedî derkevin.”

Li ser nivîsa Mamoste Deham

Mamoste Deham Evdîlîfetah, hefteya çûyî, di rûpela 6'an de bi sernava "Çend tîbînî der barê 'dahûrîna peyvân' de", li ser xebata me ya der barê morfolojîya peyvân de rawestiyabû. Xebata me ya ku bûbû mijara nivîsa mamoste jî di hejmarê 29'an, rûpela 5'an a Azadiya Welat de derketibû, bi navê "Dahûrîna peyvân (2)".

Me di wê nivîsa xwe de, 6 peyvên hevedudanî (birazî û xwarzî, kengê, kebanî, melkemat û çawa) dahûrandibû (tehlîl kiribû). Ji wan tenê "melkemat" ku ji "melk" û "mewt"ê hatibû pê, erebî bû, yê din peyvên kurdî yê resen bûn.

Em spasiya mamoste dikin ku bi helwesteke zanyarane nêzîkahî di xebata me daye û der barê şaşî û kêmasiyên me de em agahdar kirine. Bi rastî, bi wê nivîsa xwe ya ronîker em ronî kirin.

Piştî van gotinan em dikarin derbasî nav mijara xwe bibin. Di nivîsa xwe de mamoste Deham Evdîlîfetah, bi pêjnkerî (hesasî) xebata me nîrxandîye û der barê ravekirinên me yê li ser peyvên "birazî", "xwarzî" û "kengê" de "tîbînî"yên xwe pêşkêş kirine.

Bi awayekî kûr li ser peyvên "birazî" û "xwarzî" rawestiyaye. Me, di wê nivîsa xwe de gotibû ku "zî" û "za"ya hatine paşîya "bira" û "xwar"ê, ji lêkera "zan" an jî "zayîn"ê hatine.

Lê min diyar nekiribûn ku ew ji raweya fermanî ya lêkera zayînê hatine

bidestxistin.

Mamoste vê kêmasiya me destnîşan dike û bi firehî li serê radiweste ku "zî" û "za" şeweyên xerabûyî yê "zê"yê ne. Nimûne: Bizê; li vir "bi" raweya fermanî ye û "zê"jî, ji koka lêkerê ye.

Em bi alîkariya "zê"yê, ji "bira" û "xwar"ê navê hevedudanî çekin:

Bira+zê; xwar+zê.

Diviyabû me bida xuyakirin ku peyvên "birazî" û "xwarza" awayên xerabûyî yê, "birazê" û "xwarzê"yê

Di kurmançî de, tîpên dengdar "k" û "ç" bi hev diguherin. Wekî "kefî" û "çefî", "kêrî" û "çêrî", "kerm" û "çerm". Digel vê di kirdkî de ev her du tîp zehf bi hev diguherin. Nimûne: "kê" û "çê", "keynek" û "çênê"; "kes" û "çês". Gava "çi" û "heng" didine pey hev, tîpa dengdêr "î" û ya dengdar "h" dikevin, "ç" jî li "k"yê dadigere. Di encam de "çi hengê" dibe "kengê".

ne.

Mamoste dixwaze hîn bibe, ka me ew her du peyv (birazî û xwarzî) wekî ku li herêma Farqînê an jî herêmine din tîp bilêvkirin hildaye dest an na.

Em vê bibêjin ku heta niha pênc xebatên me bi navê "dahûrîna peyvân" di Azadiya Welat de derketine. Peyvên ku em li ser wan rawestiyên û me ew rave kirin, hema bibêjin tev wekî ku tîpê bilêvkirin me ew hildane dest. Piştî re jî me guhertoyên wan ên din dane, yê ku me ew zanibûne. Yanê bilêvkirina eynî peyvê, lê bi şeweyên cuda cuda.

Paşê me ew dahûrandîne û teşeyên wan ên rastîn diyar kirine. Bi taybetî me şeweyên xerabûyî yê peyvên ji xwe re kirine mijara lêkolînê.

Dîsa mamoste dide xuyakirin ku peyvê "xwar" di kurdiya kevn û farisîya kevn û nû de di şeweya "xwahr" de bûye. Bes di kurdî de teşeya (şeklê) xwe ya berê neparastîye.

Der barê şîroveya me ya "zade"yê de jî, mamoste me ronî dike. Bi me dide zanîn ku "zade" an jî "zad", ji lêkera

denganî (fonetîkê) ku di navbera "çi"yê û "k" ya destpêka "kengê" de berçav bikiira. Ango, ji me re bigota, ka çawan, di vê hev kêsiya jêr de "çi" bûye "k":

çi+heng= k?"

Rast e, em bi awayekî bi ser re, li ser dahûrîna "kengê" rawestiyabûn. Bes me ev jî hemanên wê kiribûn û me dabû xuyakirin ku peyv hevedudanî ye û jî "çi" û "heng"ê hatiye pê.

Di kurmançî de, (çendî ku ez zêde lê rast nehatime) tîpên dengdar (bêdeng, konsonant) "k" û "ç" bi hev diguherin. Em vê jî bibêjin ku jêderka her du tîpan ne yek e.

Wekî "kefî" û "çefî", "kêrî" û "çêrî", "kerm" û "çerm"...

Digel vê di kirdkî (kurmançî, zazakî) de ev her du tîp zehf bi hev diguherin. Nimûne: "kê" û "çê", "keynek" û "çêneke"; "kes" û "çês"...

Gava "çi" û "heng" didine pey hev, tîpa dengdêr "î" û ya dengdar "h" dikevin, "ç" jî li "k"yê dadigere. Taybetiyeke "h"yê jî heye ku ew tîpeke revok e. Welê ye ku kêman dikare cihê xwe bihêvişê (hifza cihê xwe bike). Wekî "hawa" û "awa", "hişyar" û "şiyar", "hewr" û "ewr"...

Ez dixwazim çend guhertoyên vê peyvê me ya hevedudanî jî bidim: kengî, kengê, kîngê, kînga...

Em bawer dikin ku van raveyan mijara me ya der barê "kengê" de jî zelal bûye.

ZANA FARQÎNÎ

"Helbestên Windabûyî" li xwediyê xwe yê rastîn digere!

DILBIXWÎN DARA



Vê carê ez dixwazim ji dawiyê dest pê bikim. Bila gotina dawiyê di destpêkê de bê gotin: "Ev helbest yê min in. Ez ecêb dimînim. Çima, çawa û ji aliyê kê ve bi navê Cegerxwîn helbestên min di pirtûkekê de hatine weşandin?"

Ez ji kesekî pîreyan naxwazim. Li nav û şuhretê jî nagerim. Ihtiyaca min bi van tîştan nîn e. Lê belê gerek e em rastiyan berevajî nekin. Eger em îro jî bo hinek berjewendiyên erzan rastiyan berevajî bikin, wê sibe hesabekî mezin ji me were xwestin..."

Xwediyê van gotinan axaftina xwe wiha berdeham dîke:

"Du destnîşanên vê pirtûkê hebûn. Yek li cem kurê Cegerxwîn Azad bû, yek jî li Helebê li cem Abû Fûad bû. Ji bo parastina pirtûkan min ew danîn wan deran..."

Kesê ku van gotinan dibêje ebûqatekî li Qamişloyê ye. Eslê wî jî bakurê Kurdistanê ye. Ji Sasonê ye. Navê wî Îbrahîm Muhamed Alî Sasonî ye.

Belê, li dawiyê, xwediyê pirtûkeke "Bêxwedî" xwedî li pirtûka xwe derdikeve.

Hikaye çî ye? Em hinekî vekin...

Di sala 1996'an, meha sibatê de ji Weşanxaneyê Avestayê pirtûkek bi navê Cegerxwîn "Helbestên Windabûyî" hate weşandin. Pirtûkê jî 58 rûpelan pêk tê û 17 helbest tê de hene.

Kesê ku ev helbest dane Berpirsê Avestayê Abdullah Keskin, Fener Rojbiyanî ye.

F. Rojbiyanî bi xwe jî ji Başûrê Biçûk e. Fener, li ser vê pîrê wiha dibêje:

"Me ji zavayê Cegerxwîn (Bilo) ku li Helebê dimîne û Ferhat Celebî pîrs kir, wan got ku ev helbestên Cegerxwîn in."

Baş e, F. Rojbiyanî ev helbest jî ku derê anîne?

Li gorî ku ew dibêje; wî di sala 1985'an de, ji kurê Mûsê ev helbest standine.

Di pêşgotina pirtûkê de jî wiha tê nivîsandin (ji xwe re li çewtiyan binêrin):

"... Cegerxwîn di dawîya salên heftêyan de bi mebesta dîwana xwe ya çaran a bi navê Ronak dîke ku here Bêrûdê. Li Sûrî rîya wî bi mala dostekî wî, Mûs, dikeve. Mûs hevaleyê wî yê komunistî kevn e û li Sûrî dijî. Di vê serdanê de Cegerxwîn dev ji fikra çapkirina dîwanê berdiide û berê xwe dide Ewropa. (...) Berî ku derbasî Ewropa bibe beşek ji Ronakê li mala Mûs dihele."

Li gorî vê yekê "Helbestên Windabûyî" beşek ji Ronakê ye, ku nehatibû çapkirin.

Bila hinek rastiyan weşartî eşkere bibin. Ji bo vê yekê ez li bersiva hinek pîrsên windayî

geriyam.

Min ji kurê Mûs, Sadiq pîrs kir:

- Çi têkîlî di navbera bavê te û Cegerxwîn de hebûn?

- Min jî ev pîrs ji bavê xwe kir. Bersiva wî wisa bû:

"Ez komunist bûm. Tu dostanî di navbera min û Cegerxwîn de tune bû. Tu caran nehatibû mala me. Me hev jî nêzîk ve nas nedikir. Tenê min ew carekê li Helebê, li mala zavayê wî (Bilo) dît. Wê dîtinê 15 deqeyan dirêj kir. Tu helbest nedane min. Ji ber ku tu sebeb tune bûn ku helbestan li cem min weşere..."

Sadiq gotina xwe wiha berdeham dîke:

"Di wan salan de tu berhemên kurdî li cem min tune bûn. Ez jî wekî bavê xwe komunist bûm, bala min behîr li ser sosyalîzm û Yekîtiya Sovyetê bû... Fener careke tenê hatibû cem min. Têkiliyeke germ di navbera me de tune bû, me baş hev nas nedikir. Di pêşgotina pirtûkê de hatiye nivîsandin ku ev helbest jî min hatine standin. Bi rastî dema ku min xwend, ez ecêb mam, ji ber ku tîştêkî wisa çênebûye."

Vê carê em werin destpêkê.

Madem wisa ye û hemû çavkanî diyar dikin ku ev helbest ne yê Cegerxwîn in, wê demê ez dipîrsim:

Bi çî mafî, bi çî cesaretê û li ser çî bingehe em helbestvanekî wekî Cegerxwîn mezin û nemir dixin bin sûcekî giran, wî dikin dizê helbestên kesên din?

Helîm Yûsiv

Jînenîgariya me dinivîsîne

Nivîsarên Helîm Yûsiv girêdayî ne bi bûyerên herêmî ve, nemaze di nav xelkê Amûdê de, ku lê bûyer fireh dibe û her tişt tev li hev dibe. Di van nivîsarên zengîn de dîrok, efsane, bûyer, çîrokên gelêrî, leylan, rastî, reşbûna bext û jiyane, civak, psîkolojî û şikestinên kesan, xewn û hêvî û hezkirin û çavsofî û hwd. hene.

LUQMAN MEHMÛD

Pirtûka Helîm Yûsiv "Mirî Ranazin" ku di 1996'an de ji aliyê Weşanxaneyê Avestayê ve hatiye weşandin, bûye meydana bûyerên gelêrî û pîrbûna sembolan, digel siruştê girtî di hundirê dîrokeke girtî de û li ber deriyekî mijokî ku ji bilî pêxember û dînan tu kes bi ser ve nabe. Ev derî ji lehiya "nû" zingar girtiye û hetanî hişyarbûna kilîtekê li Amûdê.

Ev derî wekî çiyayekî bi navê Cûdî tê naskirin, mîna efsaneyekê bi firehbûn û lawîrbûna xwe û bi stûnên xwe yên pir, nav daye. Ji ber ku cara yekemîn çîrokinê wekî 'Mirî Ranazin' kesên jibîrbûyî û bêdeng diajon ber dergehên mezin û di meydana hunerî û toreyî de wan bi cih dikin; wan bi can û çav dikin û ev bingeha herî girîng û xurt e li cem nivîskarê me.

Dîroknivîsê miriyan Helîm Yûsiv

Ew dîroknivîsê miriyan e. Dîroknivîsekî rastgo ye, ji van miriyên ku heta niha li ser Girê Şermola dilîzin û bi jiyana saxan jî dilîzin û hîn ji ser a xwe danakêvin ku ew sax in û rastî jî ew e ku em bêdeng bi mirinê re dijîn ji bo ku dengê me neçe miriyan û pêjna me nekin û raz di vê babetê de ev rastiya jêrîn e, ev rastiya tal e ku her dema dengê bi ser dengê miriyan ket, xwediyê deng dîn dibe. Ev e mebest û merema Helîm Yûsiv ji dînan.

Çimkî qonaxa jiyana bimirin, derbas kirine û ketine tengasiya dudilîyê. Sax, dînan di nav xwe de qebûl nakin û mirî jî wan qebûl nakin, ji ber vê bêçih û berdîwar dijîn.

Kî ne ev miriyên ku ranazin?

Şermola: Ne kes e hetanî ku em bibêjin sax e yan mirî ye, girekî li hemberî gorên misilmanan cih girtiye û ev gir çêbûye ji bo çevdêriya miriyan. Şermola cihê gora Şah "Êlo" ye û dema ku mir, sax tev de bi xwe re veşartî; mêt, jin, kole, lawir, mal hwd.

Nivîskarê mirî: Mirin li vir (mêcaze) leylan e, ji ber ku nivîskar tev de li vî bajarî mirine. Nivîskar an deynê



Helîm Yûsiv

Helîm Yûsiv ne bi paşerojê, belê bi pêşerojê jî mijûl e. Wisa bûye ku ew îro ji bîr dibe û bi awayekî durist li ser bûyerên ku bi kesên çîrokên wî re diqewimîn, radiweste.

xelkê tev lê hene û ev jî rê ji kuştina wî re vedike. Yan her dem dimire an jî dîn dibe û yê dîn jî ku nivîskar be mirineke rojane dibîne. Ev nivîskarê mirî, xwediyê nivîsarekê ye ku tê dîtin ne ku tê xwendin û ew nemiriye, lê mirin a sax e.

Hemîdo: Ne ji razana dê û bavêkî bi hev re hatiye. Ji nişka ve û bêplan di malzaroka diya xwe de cih girt, ji ber ku tim bavê wî jî digot ku nêzikî jina xwe nebûye, lê tim "Ayetulkursî" berî berbangê dixwend û piştî azana şevê, bi dengê melûl û xemgîn ji jina xwe ya tazî re dixwend; ji jina tazî û zikdirûtî re mîna diya me "Hewa" ku piştî neh mehan ji tiştê rêstinê mêrekî wekî Hemîdo daxist meydana mirinê.

Stûnên çîrokan

Helîm Yûsiv ne bi paşerojê, belê bi pêşerojê jî mijûl e. Wisa bûye ku ew îro ji bîr dibe û bi awayekî durist li ser bûyerên ku bi kesên çîrokên wî re diqewimîn, radiweste. Tişteki berçav e ku nivîskar, bi nermahî û zanebûn bûyerên jiyana xwe û kesên xwe tîne zimên. Nivîskar bi germayî kevîrê xwe diavêje ava toreyê û xelekên girover û xweşik li ser vê ava zelal, resim dike. Ew di riya hezkirina welat de, axa welatê xwe bi nirx û buha dibîne. Nimûne 'Ava şîn', nivîsarên H. Yûsiv girêdayî ne bi bûyerên herêmî ve, nemaze di nav xelkê Amûdê de, ku lê bûyer fireh dibe û her tişt tev li hev dibe. Di van nivîsarên zengîn de dîrok, efsane, bûyer, çîrokên gelêrî, leylan, rastî, reşbûna bext û jiyana mirov û rûyê demê ku kesên çîrokê ji ber xwe ve şîrove dibin, civaka wan, psîkolojiya wan, şikestinên wan, xewn û hêvî û hezkirin û çavsofîya wan, wisa tore nirxekî mirovayetî hildigire û nivîskar bi teknîkên bilind derbasî hundirê mirov dibe û hevpeyvînen hişyar bi wan re li dar dixîne bêyî ku tu kes ji wan, ji xew rabe.

Wergera ji erebî: BAVÊ ARAM



● 28.10.1994

Li Beşiktaş Stenbolê li qehwexaneyekî sê kes ji aliyê polîsan ve hatine kuştin. Av. Fuat Erdoğan, Elmas Yalçın û İsmet Erdoğan di saat 4'ê rojê de li qehwexaneyê bi gulebarana polîsan hatin kuştin. Li ser vê bûyerê Komeleya Mafên Mirovan (IHD) heyetek şand, li qehwexaneyê lêkolînê kirin. Endama IHD'ê Av. Eren Keskin daxuyand ku polîsan kesên ku li qehwexaneyê bûne derxistine derve û ew kuştine.

● 01.10 heta 30.10.1994

28 kes bi awayekî faîl meçhûl hatin kuştin. Ji van 5 kes li Edeneyê 23 kes jî li Kurdistanê ji aliyê hêzên kontrayî ve hatin qetilkirin. Piraniya

wan kesan gundî û esnaf bûn. Ji wan du kes Sefer Cerfu û Rabih Çabuk endamên HADEP'a Edeneyê bûn ku li qehwexaneyekê ji aliyê hêzên tarî ve hatin qetilkirin.

● 29.10.1928

Komara tirk hate avakirin. Piştî şoreşa Fransayê li Ewrûpayê serhildanên gelên bindest dest pê kir. Daxwaza azadî û serxwebûnê hêdî hêdî ber bi Rojhilat jî hat. Împaratoriya Osmanî jî wekî ku tê zanîn dewleteke mêtînger bû, gelên bindest ên balqanan û ereb jî bi serhildanan dewleta osmanî ji erdê xwe derxistin. Di 29'ê kewçêra 1923'an de komara tirk bi hevkarîya gelê kurd û tirk hate avakirin.

AWIR

Hizbî-kontra nikare xwe biparêze

Taybetiyeke dewleta tirk ev e; dema ew karê xwe bi hevkarên xwe diqedîne, wan diavêje aliyekî, heta ji bo veşartina sûcên xwe wan digire, diavêje hundir. Ji bo vê yekê mînaka herf baş, rewşa hizbî-kontra ye. Her kes dizane ku bi sedan welatparêz bi destê vê hêzê hatine kuştin. Lê êdî ew nikarin xwe li hem-berfê êrîşên gel biparêzin.

Dewleta tirk di warê meşandina taktîkên şer de gelekî şareza ye, sedema vê yekê jî diyar e; evdewlet li ser hîmê Împaratoriya Osmanî ava bûye. Wê împaratoriya ku di dawiya jiyê (emrê) xwe de wekî "mîrovê nexweş" dihat binavkirin, bi dek û dolaban karibû 600 salî xwe li ser piyan bigire.

Hêzên ku dewleta tirk di van 12 salên dawîn de ji nav civaka kurd derxistine û li hemberî tevgera kurd bi kar anîne, hêjayî lêkolîn û lêhûrbûnê ne. Hêzên ku wekî kurmê ji darê li hemberî tevgerê rabûne; cerdevan, hizbî-kontra û îtirafkar giş bi destê dewletê hatine afirandin û zirareke mezin gihandine gelê kurd.

Taybetiyeke dewleta tirk jî ev e; dema ew karê xwe bi hevkarên xwe diqedîne, wan diavêje aliyekî, heta ji bo veşartina sûcên xwe wan digire, diavêje hundir.

Dema mirov bala xwe bide çend bûyerên van rojên dawî ev rewş xwe dide der. Li Kurdistan û Tirkîyeyê li pey hev 'çeteyên biuniforma' derdikewin holê, ev çete jî tîm, cerdevan û îtirafkaran pêk hatine.

Dîsa li gorî agahiyan, dewletê dest daniye ser çekên zêdetirî sê hezar cerdevanî. Piraniya wan jî ber karên pîs wekî; şelandin, bertil û xûgiyê ji kar hatine avêtin. Divê bê gotin ku gelek jê jî, ji ber ku alîkariya gerîla kirine ji cerdevaniyê bûne. Ev yek jî diyar dike ku qet nebe, kurmên ku naxwazin zirarê bigihînin darê jî xwe hene.

Ji bo diyarkirina helwesta dewletê mînaka herf baş, rewşa hizbî-kontra ye. Her kes dizane ku bi sedan welatparêz bi destê vê hêzê hatine kuştin. Lê êdî ew nikarin xwe li hemberî êrî-

şên gel biparêzin.

Li gorî agahiyan ku ketine destê me, di destpêka vê mehê de li Nisêbînê li Sûka Qaçaxçiyân, di navbera endamên hizbî-kontra û gelê bajêr de pevçûn derketiye.

Çavkaniyên herêmî didin zanîn ku, hizbî-kontra xwestine xortekî ji Malbata Seyidan ji Lîseyaya Nisêbîn biqewirînin. Ev malbat li bajêr wekî malbateke welatparêz tê nasîn. Li ser vê yekê hin kesên ji vê malbatê diçin dukana yekî hizbî-kontra û jê dixwazin ku ew dev ji xisletên xwe yên berê berdin. Lê ev kes bi awayekî nebaş bersiva wan dide, ji ber vê yekê, ew li yê hizbî-kontra didin.

Roja din hizbî-kontra amadehiyên xwe dikin, dixwazin êrîşî mal û dukana Malbata Seyidan bikin. Lê ji ber ku gel ji berê ve li wan bi rik e, ew jî amadekariya xwe dike, lewma jî di bîstekê de li dora hezar kesî li ser serê wan dicive. Gelek endamên hizbî-kontra direvin, lê sê kes di destê gel de dimînin. Ew sê kes, lêdaneke giran ji gel dixwin. Ji wan sê kesan Hecî Şêxoyê dirêj û kurê wî rakirine Nexweşxaneyaya Amedê. Yê din ku kurê Îzeto ye, nayê zanîn ku çi pê hatiye.


Tê gotin ku Îzeto jî di nav karê kontrayî de cih girtiye û bi destê welatparêzan, par hatiye lînkirin. Tê gotin ku piştî vê bûyerê hizbî-kontra êdî newêrin dukanên xwe jî vekin.

Li gorî kesên ku bûyerê dîtine, ji nav hizbî-kontrayan hinekan çek kişandin, lê gel rê nedaye wan û bi daran li wan daye, polîsan jî bi tenê çekên ku ji destê wan ketine, berhev kirine û xwe jî şer dane alî.

SAMÎ BERBANG

ÇAVDÊRÎ

MÎRHEM YÎÇÎT



Stratejiya neteweyî

(II)

Siyaseta neteweyî yanê awureke kurdî, nêrîna bi çavên xwe û ji pencera xwe. Stratejiya neteweyî mêzîn û pîvanên kurdî dixwaze. Çawa alman, siyasetmedar û birêvebirên alman, belçkî, ûngiliz, yan amerîkî û filan û bêwan dewlet, her yek bi awayê xwe li meseleyan dinêre, xwediyê mêzîn û pîvanên xwe ne û berjewendiyên xwe di ser her tiştî re digirin û pir caran a wan sexte û ne însanî ye jî, em jî divê berjewendiyên neteweya xwe ne li parçeyekî, belê li seranserê Rojhilata Navîn di ser her tiştî re bigirin. Em jî divê ji zawiye û hindama qencî û xerabiya xwe li meseleyan binêrin, wan binirxînin û li mafên xwe bi çar lepan xwedî derkevin û biparêzin.

Siyaset û stratejiya neteweyî hişmendiya neteweyî, mesûliyet, xemxwari, paxav û mitala neteweyî ne tenê li parçeyekî belê ji bo giş parçeyan, ne ji bo beşek gel, belê ji bo tevaya gelê kurd bi xwe re çêdike, dike elxaq û adet ji xelkê re.

Stratejiya neteweyî yanê tu bi xwe siyaseta xwe datîni, dineqîni. Tu di destên xwe de yî. Nanê te di tûrikê te de ye. Îrade te ne girêdayî filan û bêwan e. Tu kengî şer dikî, tu kengî bi kîjan dewleta dagirker re ya jî dewleteke din-re rûdinî, tu kengî şer radiwestîni û tu kengî aştîyê dixwazî, tu kengî beramberî kîjan dewletê kîjan taktîkî dimeşîni, tu biryar didî û van gişkan berjewendiyên neteweyî diyar dikin. Rû û weçekî din yê stratejiya neteweyî ew e ku malbatparêziyê, mêji û rewîştên eşîrî, navçeyî û parçeyî qebûl nake. Fikra neteweyî û yekîtiya neteweyî dixwaze. Qencî û xêra netewe di ser giş berjewendiyên bawik, ezbet, sulale, mezheb, ol, filan bajarî û bêwan pareyî re digire.

Stratejiya neteweyî tolerans û bêhnfirehiya nav xwe, aştîya hundir û yekîtiya li dijî dagirker û dijminan dixwaze. Merkezbuûneke giştî û herşaxî ferz dike. Otorîteyên hûr, çend gumrikan, çend eskeran, çend polîs û hwd. çendserîtiyê û hedefbelawelahiye qebûl nake.

Îro li welatê me du hewlên serekî hene. Mebest hewlên ku bûne hêz in, xwedî çekdar in û di nav gel de xwedî piştgirî ne. Li ser vî esasî mirov dikare behsa du celeb siyasetan bike. Strateji û siyaseta Kurdistanî, neteweyî û serxwebûnxwaz û strateji û siyaseta herêmî û emaretxwaz. Serokayeti û pêşengiya strateji û siyaseta yekê Partiya Karkerên Kurdistanê dike û serê strateji û siyaseta duyemîn jî hêzên Başûrê Kurdistanê û di dereceya yekemîn de DK diçîne. Hêzên mayî, rêxistin û meylên din bi awayekî, yan bi awayê din li hêzekê jî van herdu hêzan nêzik in û di plan û dereceya duyemîn de ne.

PDK îsal 50'mîn sala xwe pîroz kir. Meha li pêşiya me Partiya Karkerên Kurdistanê de 18 salên xwe tamam bike. Di nav temenê PDK û Partiya Karkerên Kurdistanê de 32 sal ferq hene. Bêje hema PDK sê emrên Partiya Karkerên Kurdistanê kirine. Lê gava mirov bala xwe dide pratîk û karên partî û serokatiya wê ku di vî emrê 18 salî de kirine, mirov dibîne bê ka ferqa di nav strateji û serokatiya Kurdistanî û strateji û serokatiya emareti de çendî mezin e. Tu ji kîjan alî de 18 salên şoreşa Bakur bigirî û binirxîni tu dê bibîni ku serkeftinên mezin û qevzên dîrokî hene. Ev serketin ideolojîkî û siyasî ne, leşkerî ne, kulturî ne, diplomatîk in, rêxistinî û dezgehî ne, girêdayî çapemeniyê, weşan, medya û literaturê ne.

Strateji û siyaseta ku di rêberiya her du hêzên serekî de û bi taybetî di serokatiya PDK de reng û şikil girtiye her çendî ev li dora 36 salan e ku ne bi tenê li Başûrê welat û heta berî şoreşa Bakur li dar bikeve li giş welat alternatîfa bi tenê bû, îro hatiye dawîya qonaxekê û li ber deriyê qonaxa nû bi du rîyan re li hemberî hev e:

Ya wê dev ji stratejiya heta niha berde, terka malbatperestî û navçegeriyê bike û li stratejiya neteweyî û Kurdistanî nêzik bibe yan jî dê li ser rê û ribaba kevn here, bibe maşîk û dardest di destên vê dewletê û dewleta din de, bimîne kurmê darê, çedew û dîba dehselan û ji ber vê jî têkeve ber êrîş û xezeba xelkê.



Em dibêjin ku divê xebata me di muzîka kurdî de ji pêşketina tarzeke nû re alîkariyê bike. Gerek e em otantîzma xwe û têkoşîna gelê xwe bigihînin hev û sentezekê jê derxînin. Em niha li ser vê yekê disekinin. Di civaka kurd de eşq û evîn cihekî gelek mezin distîne. Divê huner-mendên kurd vê hestê bi evîna welatê xwe ve girê bidin.

Huner bi zorê çênabe

Muzîka kurdî warekî xam e, nemaze li bakurê welêt. Kom û kesên ku bi muzîka kurdî re eleqedar dibin, niha ji berê bêhtir in. Ev rewş dibe sedema cihêrengiya xebat û berhevan. Ligel vê rewşê di muzîka me de "lêgerîn"ek xwe dide xuyakirin. Koma Agirê Jiyân, ku komeke Navenda Çanda Mezopotamyayê ye, bi xebata xwe ya bi navê "Adarê" bal kişande ser tarza xwe. Berpîrsê me yê nivîsaran DÜZGÜN DENİZ bi wan re peyivî.

Her çiqas tabîreke giştî ya muzîkê hebe jî, dîsa her kesek wê li gorî xwe dinavîne. Lewma ez dixwazim ji we bipîrsim bi ya we muzîk çî ye û ji bo çî tê çêkirin?

■ Muzîk di nav şaxên hunerê de şaxek e. Bi ya me ev xebat ji bo guhartin û nûkirina civakê pêk tê. Bi vî awayî mirov hest û ramanên xwe û yên civakê tînin ziman. Mebest bi tevahî pêşveçûna civakê ye... Di navbera dîsîplînan de cihêbûnê çêdike. Ev cihêbûn hem di teknîkê û hem jî di uslûbê de tê dîtîn. Li gorî wan şaxên din, muzîk xwe di deng û di bê dengiyê de nîşan dide. Muzîk ew e ku mirov hestên xwe bi deng û awayekî armonîk tîne ziman. Bi kurtasî ev tarzek e ji bo daxuyakirina hestan û bikaranîna dangan. Zindîtiya xwe jî, ji melodî û harmoniyê distîne.

Agirê Jiyân di muzîka kurdî de ji xwe re çiqas cih vebiriye (vekirîye)?

■ Em dikarin bibêjin ku koma me bi tevahî ketiye nava muzîkê. Heke ku

mîrov di nav vê xebatê de be divê ku jê baş fêm bike û pê bi zane; dû re jî xwe bi wê nasnameyê bide nasîn. Rastî ev e ku, kesên ku xwe wekî muzîkvan dihesibînin gere pêşiya her tiştî jî muzîkê nas bike; ji dîsîplîn û ji qeydeyên we haydar be. Her wiha ew tişt divê di rîya armançê de bê bikaranîn. Em bi wê baweriyê karên xwe didomîn. Her tim di bîra me de ye ku, ew xebata karê me yî sereke ye.

Koma Agirê Jiyân kengê û çawa damezirî?

■ Koma Agirê Jiyân di dawiya 1992'yan de hate damezirandin. Ji wê rojê heta îro jî, gelek hevalan xebatên xwe domandin. Dû re jî, ji ber hin sedeman hinek ji komê veqetîyan. Komê berî damezirîna xwe daxwaz û armanca xwe diyar kiribû. Lê îro ku em dimêzînin, em dibînin ku hin daxwaz û hêvî nehatine cih. Nika ev ên ku bi dest neketine, ji wan hinekan êdî girîngiya xwe wînda kirin û ji nav daxwa-

zên me derketin. Yên ku hê jî lazîm in, dîsa di rojeva me de cih digirin. Divê ev pêk bên.

Derketina kasetê me jî divê wekî gaveke ber bi pêkhatina van daxwazan bê şîrovekirin. Daxwaz, hinekî din nêzik bûyîna armanca mezin e. Nika em gihîştin vê yekê. Me du meh berê kasetê xwe ya yekemîn (single) bi navê "ADARÊ" derxist.

Ji ber serkeftina kasetê, em gelek kêfxweş in. Kasetê gelek bal kişand û heta nika hem ji aliyê firotanê ve û hem jî aliyê rexneyan ve sînyalên gelek baş daye. Vê tabloyê bêguman tesîreke mezin li ser komê kiriye, ji ber vê yekê em ketine nava motîvasyoneke baş.

Konser û çalakîyên me bi rengekî din tînin temaşekirin. Wekî din jî tesîrên pir mezin li ser konseran çêkir. Ji ber hezkirina ji kasetê, hejmara beşdaran zêdetir kiriye. Gava ku guhdar zêde bûn, bêguman hejmara firotinê jî wê zêde bibe.

We di daxuyaniyeke xwe de gotibû ku "Tarza me hîna ne kifş e", gelo hûn li ser wê yekê dikarin ji me re çî bibêjin?

■ Tarzeke bîngehîn jixwe ji me re wekî armanç e. Lê belê, em naxwazin bi lez û bez tişteki ji xwe re deynin. Belê ew ji me re wekî nîşangeh be jî, lê

nayê wê maneyê ku em bikevin ser xetê bêqelîte. Bi kurtasî, em dikarin bibêjin ku bi zorê huner çênabe. Ji ber vê yekê jî, em hê jî nabêjin ku tarza me ev e. Ji bo me cêribandin gelek pêwîst e. Ew pêwîstî piranî ji bo bîdestxistina nûnertiya nûjeniyê heye.

Em çî dibêjin? Em dibêjin ku divê xebata me di muzîka kurdî de ji pêşketina tarzeke nû re alîkariyê bike. Wê çawa bibe? Bersiy yek e; otantîzma xwe û têkoşîna gelê xwe bigihînin hev û sentezekê jê derxînin. Em nika li ser vê yekê disekinin.

Bi ya we, muzîkvanên rewşenbîr di xebata xwe de pêwîst e otantîzmê çiqas bi kar binin?

■ Li gorî bawerîya me, ji muzîsyenên rewşenbîr re sînorê bikaranîna otantîzmê tune ye. Lê di vir de xala girîng ew e ku, ev bi çî awayî hatiye kirin? Jixwe muzîsyenên jêhatî û yên zana vê yekê baş dizanin û otantîzmê ji xwe re wekî çavkaniya herî mezin dipêjînin, jê îstifade dikin. Ew xebat, jixwe wekî pîvana nêzîkbûna huner-mend ji nîrx û hêjahiyên gel re ye.

Piştî derketina kasetê we, daxwazên we çiqas hatin cih?

■ Pêşî em bibêjin ku kaset ne her tişt e. Belê hin daxwazên me lê bar bûbûn, lê ne her tişt bû. Gihîştina arman-

cê ne hêsan e; rîya wê gere derece bi derece, gav bi gav bê meşandin. Hêviyên me ne zêde bûn, me ji rastiya xwe fêhm dikir. Ji ber vê yekê jî hêviyên me hatin cih.

Hêviya me ya herî mezin, hezkirin û kêfxweşbûna gelê me û wekî din jî ya hemû guhdaran bû. Di konser û hejmarên firotanê de jî me dît ku, serkeftin çêbûye. Ew jî tişteki nîşan dide ku xebatên me yên cur bi cur ji aliyê guhdarên muzîkê ve bi dilxweşi hatine qebûlkirin. Her wiha, tê dît ku mirov gava tişteki xweşik pêk bîne, civak jî wê dipejirîne û alîkariya xwe jê nahevişîne. Ji bona vê yekê jî divê em fikr û ramanên li ser xebata bi vî rengî gur û kûr bikin.

Firotana hejmara berhemana her tim dibe pîvana qalîteya wê gelo?

■ Em dikarin bibêjin ku hetanî radeyekê, hejmara firotanê bi qalîteyê ve girêdahî ye. Ev nayê wê maneyê ku qalîte tenê ev e. Ev jî parçeyekî rastiye ye, parçeyê din jî pîvanên honandin û mantalîteya berhemê ye. Serkeftina berhemana bi sê xalan re girêdahî ye:

Yek, hêsaniya bidestxistina (belavbûna) berhemê, didu nîşandayina hestên rojane yên civakê, ya sisiyan jî hevgirtina hestên civakê û naveroka berhemê.

Mînak; kasetên enstrumantal em bibêjin; ew kaset gelek bi qalîte ne. Lê dîsa jî ji aliyê gel ve zêde nayên peji-randin û nayên kirîn. Ma ev ji bêqalîtebûna wan e? Na! Ev bi piranî ji hev negirtina frekansa berhemê û frekansa çand û ramanên civakê ye.

Kaseta we ji aliyê kêmasiyên we ve, çi nîşan da?

■ Bêguman me kêmasiyên xwe dît. Hem ji aliyê deng û hem jî ji aliyê enstrumanan ve. Lê heta îro bi zêdeyî ji me re rexneyên erênî (pozîtîf) hatin. Em ji gelek derdoran haydar in ku, ew ji kasetê memnûn in. Rexneyên bi vî rengî jî, bandoreke gelek baş li ser xebata me yên îro dike. Divê xelet neyê fêmkirin ku rexneyên neyînî (menfî) ji me re bêfeyde ne. Na, ne rast e em ge-



re ji van jî sîdê (istîfade) wergirin. Ji ber ku ew ji me re wekî îqaz in û pêşî li çewtiyên nû digire.

Hejmara firotanê ku hûn gihîştinê gelo normal?

■ Em bi hêsanî dikarin bibêjin ku "Adarê" di nav kasetên muzîka kurdî de hemûyan zêdetir hatiye firotin. Lê dîsa jî ev hejmara ne hejmareke xwezayî ye. Li gorî baweriya me, potansiyela firotana Adarê hê jî zehf e. Problem xwenegihandina mirovan e. Ji ber ku di belavkirinê de gelek astengî çêbûn û gelek xeletî hatin kirin. Ev problem gava ku ji holê rabe, wê zêdetir bê firotin.

Wekî din jî, em di reklama kasetê de jî nebûn xwediyê roleke mezin. Ji vê yekê jî danasîna kasetê baş nehate kirin. Ji derveyî me jî gelek caran û li gelek deveran hêzên fermî li pêşîya belavkirinê astengiyên mezin derdixînin. Ew kirinên nehiqûqî hê jî berdewam in. Bes em dîsa jî bi qezenc in.

Otantîzma me, bi zêdeyî mijara wê evîn û eşq e; hûn ji vê yekê çawa îstîfade dikin û çawa lê dînhêrin?

■ Belê hûn jî dizanin ku otantîzma wekî motifên dîroka civakê ye. Bi tesîra wê pek hatiye. Şeklê xwe jî wê tesîrê girtiye. Ku baş bê nihêrtin ev rastî wê bê dît. Ew bi civakê ve kîpekîp (pihêt) girêdahî ye. Hemû hêmanên wê jî çanda jiyana wê civakê tî. Rast e. Di civaka kurd de eşq û evîn cihekî gelek mezin distîne. Ew ne tişteki xerab e. Ku ev hest tunebûya berhemên kurdî yên herî navdar "Mem û Zîn", Siyabend û Xecê û hwd. wê derneketana



holê.

Lewre her çiqas ku ew hest di stranên gelêrî de cihêki mezin bistînin jî, divê hunermendên kurd vê hestê bi evîna welatê xwe ve girê bidin. Li gorî

Pîştî derketina kasetê me kêmasiyên xwe dît. Hem ji aliyê deng û hem jî ji aliyê enstrumanan ve. Lê heta îro bi zêdeyî ji me re rexneyên erênî (pozîtîf) hatin. Em ji gelek derdoran haydar in ku, ew ji kasetê memnûn in. Rexneyên bi vî rengî jî, bandoreke gelek baş li ser xebata me yên îro dike.

me her tim rastiya bingehîn ew e. Eşq û evîn jî bi vî awayî divê bê nasîn. Jixwe stranbêjên kurd ên berê jî her tim di vê maneyê de bi kar anîne. Yanê eşq û evîn di maneyê mecazî de şixulandin. Di dawiyê de em dikarin bibêjin: Otantîzma me, jêderka (çavkanî) çand

me ye.

Etîk û têkoşîn di xebata we de wê çawa hev û din bibînin û di nav hev de bihelin. Metoda we wê çi be?

■ Bêguman, dema ew her du peyv jî di muzîkê de werin cem hev, divê hunermend wan her duyan li hev bîne. Lewre jî pêwîst e hunermend zana, jîr û jêhatî be. Zanabûna hunermend jî hestgirtina wî re, jîr û jêhatîbûn jî ji bo bikaranîn û honandina berhemê lazim e. Ji ber vê yekê jî, hunermend gere ji çand û dîroka civaka xwe baş fêhm bike, jê hez bike, têkoşîn û armanca wan jî xwe re pîvan bizibe. Gava ev şert û mercên ku em dibêjin bi hunermend re



hebe, êdî peywira (wazîfe) wî têkildarkirina van her du peyvyan e.

Bi ya we asta (sewiye) têkildariya hunermend û saziyên politîk divê çi be?

■ Tercîhên mirov bi her alî ve, hemû tarza nêzikahiya wî/wê ya jiyane re ye. Ew jî bi tevahî bi dîtineke politîk ve girêdahî ye. Livirbûna me jî, ji ber vê yekê ye. Rastî ev e: Kesên ku tercîhên wan ên politîk wekî hev in û yan jî hev û din digirin, bêguman wê werin ba hev, bi awayekî din bibin hêzek. Ew jixwe rewşeke normal e û bi vî rengî jî xwe bi motifên politîk dixemilînin.

Bi rastî jî ji berê ve heta îro jî hin tişt hene ku her tim mijarên leckirin û gengeşiyên rewşenbîrên dinyayê ne. Ev mijar jî wisa ye.

Têgihên wekî pere, ewr û vîde (cer) çi tînin bîra we?



Ewr, Sivikahiyê û xeyalên mirovî dixê bîra min. Vîde (cer) jî wekî pira li ser rîya dozê ye.

Şener: Pere, ev kaxiz e ku mirovahiyê dike xulam û dejenere dike.

Ewr, Wekî sembola baran û paqijkirina qirêjî ye. Vîde (cer), mîsogerkirina (garantîkirin) pêşerojê tîne bîra min.

Nika hûn di beş û salên gelek stratejîk de ne. Ji ber ku mesajên we ji ciwanan re gelek girîng in û mesajên we jî pir bi bandor in. Gelo hûn dikarin ji wan re tişteki bibêjin ku 50 sal ji bibore xwe hê jî rastiya xwe tişteki wînda neke?

■ Kesên ji xwe bawer, serbixwe, hezkirî ji mirovahiyê, ji xeta xwe haydar û her tim li pey guherîna xwe û ya civakê ye û wê ji xwe re wekî armanc dibîne; ew kes dikare bibe nûnerê îdeolojiyêke xurt.

Endamên koma we ji xwendinê hez dikin gelo? Pirtûkên ku nika di destê we de ne kîjan in? Hûn ji guhdarên we yên ku naxwînin re dixwazin çi bibêjin?

■ Koma me ji aliyê bikaranîna ziman ve di astengiyê de ye. Em jana vê yekê baş dizanin. Musîbeta ku li vir tesîr daye, kolonyalîzma e. Lê gava ku em her tiştî li ser vê yekê bar bikin, em dikevin nava xeletiyêke mezin. Na heke ku mirov hinek çad bike û hewl bide xwe, em bawer dikin ku wê ev astengî ji holê rabe. Di vir de berpirsî dikeve ser milên weşanên kurd. Azadiya Welat di warê xwe de weşanêke serkeftî ye.

Îro ne tenê ji bo hînbûnê çand û hunera neteweyî, ji bo şîrovekirina rojên werin jî, xwendin gelek pêwîst e. Her wiha ji bo gihîştina mirovî û şexsiyeteke bi rûmet xwendin şert e. Divê her rojê bi kêmanî rojnameyek bê xwendin. Ji bona xebata we em serkeftineke mezin dixwazin.

Nika hûn çi dikin, xebata we çawa dimeşe?

■ Nika em di nav gelek xebatên kîp de ne. Ji aliyê tûrneyan ve programên me jî gelek in. Kêfxweşiya herî mezin li vir; di şev û çalakiyên me de gel slogan û dirûşmên serkeftinê û yên baweriyê tîne zimên. Jixwe bi tenê, ji bo vê yekê be jî divê em xebata xwe xurtir bikin.

Şabaş ji te re

Ji Seblax heta bi Mûnzûr, Ji Agirî û Tendûrek lek bi lek, heta bi Baboxkê û Şaneşîn, keç û xortên te yên dilêr û delodîn, her sal di vê roja pîroz de, pêk ve, bi yek dengê ji hezaran devî dibêjin: Şabaş ji xortê Hesarî re, Şabaş ji te re Cegerxwîn.

Cegerxwîn

*Ji yarê re çî rêkim ez diyarî
Diyar e yar dixwazî min bi yarî
Dixwazim can û dil jê ra bişînim
Tenê şerm e hemî derd û hejarî...
Dixwazim her du çavan jê re rêkim
Bikêr nayên ji wan her xwîn dibarî
Divêm jê re ziman û dev bişînim
Ne hêjan e şev rojan bizarî*

Ma hîn tu dê jê re çî bişîni? Ma çî yê te ma ku te jê re neşand?! Ronîka çavan, şiyana dest û piyan, bi rûgeşî, bi dilxweşî, ji kevçîka dilê xwe, ji hemû viyana xwe te ji wê yara nazenîn re pêşkêş kirin. Ew hemû derd û hejariya dil û can, îro, ji yara nazenîn re bûne çare, bûne derman.


Ji Serhed û Fereşîn, heta bi Zozik û Hindirîn, ji Ava Muradê heta bi Rûşîn, pêk ve şahid û pesindarên te ne, her sal di vê roja pîroz de, pêk ve bi yek ahengê dibêjin: Şabaş ji xortê Hesarî re, şabaş ji te re Cegerxwîn!

*Nalînek tê guhê min lê wînda û nihane
Agir berda dilê min tev bû pêt û dixan e
Barek da ser milê min lê barekî giran e
Dane ser hev kulê min hemî derd û belan e*

*Îro roja xebatê, serxwebûn e doza we
Dema jîn û felatê, li kû maye soza we
Hûn tev şêrên dilatê, rovi ketye koza we
Şikestîne dimatê, dijmin birye boza we*

Mêran e îro li welatê kurdan. Li şûna wê nalîna wînda û nihane, îro li seranserî welatê kurdan qêrîn û tilîlî û halan e. Agirê di dil de bêhtir gur bûye, daxwaza bav û kalan îro nêzîktir bûye. Qebqeba mêkew û kewribatê zozanan e, li deşt û çiyân, li newal û geliyan govend û dîlan û seyran e. Ji bo mirandîna derd û kulên sedsalan, îro ew roj e ya ku te gotibû; tarîx û asman bombardûman e, li deşt û zozan gulebaran e, kerb û kîn û dilman e. Nevçîrkên Gurê Gal Zû, Zarokên Xanî îro çeleng û baz in, bê gilî û gazin, serbilind û aza, li ser rêçîka Şêx Seîdê Kal, li dûv daxwaza Îbrahîmê Heskê Têlî, Elîşêr, Seyid Rizoyê Dêrsimî û bi hezaran lehengên dîtir, çarhawîr bi lêdan û navtêdan dibazin.

Ji Seblax heta bi Mûnzûr, Ji Agirî û Tendûrek lek bi lek, heta bi Baboxkê û Şaneşîn, keç û xortên te yên dilêr û delodîn, her sal di vê roja pîroz de, pêk ve, bi yek dengê ji hezaran devî dibêjin:



Mêran e îro li welatê kurdan. Li şûna wê nalîna wînda û nihane, îro li seranserî welatê kurdan qêrîn û tilîlî û halan e. Agirê di dil de bêhtir gur bûye, daxwaza bav û kalan îro nêzîktir bûye. Qebqeba mêkew û kewribatê zozanan e, li deşt û çiyân, li newal û geliyan govend û dîlan û seyran e.

Şabaş ji xortê Hesarî re, Şabaş ji te re Cegerxwîn.

*Hey felek felek hey zalim felek
Kanî Kurdistan ka Birca Belek
Min nevê cenet ji te bi minet
Serbest û aza va çûm cehenem...*

Dawiya dawî te bi ya xwe kir. Dawiya dawî li 'cenet'a xelkê ya bi minet te neqedand, "serbest û aza" tu vegeyriyayî 'cehenem'a xwe. Tu ji her kesî çêtir dizanî ku "Şam şekir e lê welat şêrintir e".

Çûyîna te her çende bédeng û bêreng bû, lê vegera te ew qasî payebilind, bi şeng û beng bû. Bi hezaran êzingên agirê cehe-nema te lek bi lek, rêz bi rêz, çeng û bas-kên wan vekirî hatin pêşewaziya te û tu, xortê malê, zavakê salê, ji dil û can tu kirin hambêz.

Dîsa bi tilîlî û bi halanan, Rêzan û Rojîn, Azad û Nûşîn, Salar û Midya, Sîdar û Mizgîn, helbet, Pîra Torê û Fata Sermezî jî bi wan re, di vê roja pîroz de, pêk ve, bi yek dengê ji hezaran devî dibêjin:

Şabaş ji xortê Hesarî re, şabaş ji te re Cegerxwîn.

*Me da ser rêçîka hat û nehatê
Bi gernasî ketim kar û xebatê
Heye çil sal ku porsorê dixwazim
Ku pîr bûm ji nû şêrîn niha tê*

Ne hinde xemxwer be. Bê çawa tu xort hatî, tu wisa jî xort çûyî û dawiya dawî tu gihîştî Şêrina xwê. Dawiya dawî tu bi miradê xwe şa bûyî, te porsora xwe hambêz kir. Hem jî, sermedî...

Her wisa te bi ya xwe kir. Di encam de tu vegeyriyayî tozgezvka jînê, tu vegeyriyayî kevnewaran û li vê tozgezvka jînê, li van kevnewaran tu bûyî mêvanê sermedî yê hemû xoştiviyên ber dilê xwe, ewên ku bi salan tu bi dûv wan de giriya-yî, ew ên ku bi salan tu li ser wan naliya-yî, kaliyayî.

Wisa diyar e ku di van şevên payizan de niha her şev şevbuhêrka te bi berfirehî digere û bi wî zarê xwe yê nazîk û şêrîn, ji wan re serpêhatiyên xwe yên buhar û havînan, li ber dengê "Lûr de lûr" a Hesoyê şivan evîndarê Zelxê, tu evîna xwe ya digel Serwayê dibêji.

*Wextê şêher rabe ji xew biskan li ser
dêman veke*

*Neynik li ser masa sedef zulf û
girêbandan şeke*

*Çente bi destê tey sipî zêrbazinan
ceng û şer e*

*Dakev ji nêv Birca Belek nazdariyan
dîsa meke*

*Zendan li zendê min bipêç, seyran
li nêv baxan bîkin*

*Şensê min e Serwa ciwan şêrîn ken û
meşwerdek e*

Her sibe bi avêjtina elendê re, sirweya bayê Qeşefirê digel qebqeba kewên Metîna, Gare û Bêxêr, rûyê deşta Dubanê û deşta Hesinan dialêse û ber bi wargehê evîne, ber bi Qamişloka evîndaranî, di ser Birca Belek re rewane dibe û silavên pîr evîn ên Lalixana Goveyî, Mehribana Berwarî, Mem û Zînê bo te radigehîne û li ser ziyaretgeha te dike bawêşîn.

Her wisa, di vê roja pîroz de, em hemû pêk ve, bi yek dengê ji hezaran devî dibêjin: Şad û bextewer bimîn, şabaş ji xortê Hesarî re, şabaş ji te re Cegerxwîn.

DILDAR ŞEKO



Li navendên çandeyî çalakîyên vê hefteyê

● 27.10.1996 **Yekşem**

Ji NÇM'a İzmirê Şanoya Hêvî "Sîmûrg û Ronahî", saet 14:00

Konser: Ozan Delîl, saet 18:30

● 30.10.1996 **Çarşem**

Semîner: Ragîp Zarakolu. "Ulusal kurtuluş savaşlarının dünü bugünü" (Doh û froya Şerê Rizgariya Neteweyî)

Li NÇM'a İzmirê

● 27.10.1996 **Yekşem**

Semah ve Deyiş (Semah û Lawîj), Pîr Sultan 'Abdal Demeğî.

Nazım Sadık û Ayten Balıkaya, saet 18:00

● 31.10.1996 **Pêncşem**

Çend mînak ji xwarinên kurdî, saet 19:00

Li Evrensel Kültür Merkezi

● 27.10.1996 **Yekşem**

Semîner: "Ekim devrimi ve resim" (Şoreşa Kewçêrê û wêne)

Amadekirin û pêşkêşkirin: Ressam İbrahim Çiftçioğlu, saet 14:00



Fîlm: "Damdaki Kemancı (Kemaniyê li ser banî)", saet 18:00

RÛDAN

Dewlet bazarê dike!

TÎŞK

ŞÜKRÜ GÜLMÜŞ



Kurê Fatima Reşî

Merheba ji we re xwendevanên hêjal.. Ez di destpêka nivîsa xwe de dixwazim xwe bidim naskirin. Navê min Mihemed Şîkrî Gulmûş e. Bi tirkî wiha tê nivîsandin; M. Şükrü Gülmüş. Çiroka navê min, paşnavê min, bi kurdî wiha ye:

Berî avabûna komara tirk, hemû mirovên kurd û Kurdistanê bi navê bavên xwe dihatin naskirin an jî bi navên dayika xwe. Wekî Eliyê Ünîs, Êlîkê Bettê, Şewketê Hekkî Efendî, Mihemedê Semsê, Xelîlê Xanimê û wekî min kurê Fatima Reşî. Navê bavik, dayik, cih û war, dibûn paşnav ji mirovan re.

Piştî avabûna Komara Tirkiyeyê ew nav û paşnavên me jî hatin guhartin. Memûrê Nifûsê li rûyê me, li bejna me nihêrî û em bi nav û paşnav kirin. Got: "Tu Öztürk, "Tu Türkan", "Tu Oğuz"... Got û got. Me tu carî îtiraz nekir. Miletên bindest nikarin îtiraz bikin. Mafê wan î peyivîne tune ye. Ji malbata me re jî got: "Hûn jî Gülmüş" in. "Gülmüş" çi bû? Me tu carî ne meraq kir, ne jî pirsî. "Gülmüş" a me, carinan bû "Gümüş", me dîsa nepirsî. Çi digotin li bejna me dihat!

Em, bi malbatî, ji gundê Reşiyê ne. Navê Reşiyê jî kirin "Karaköy". Navê bavê min Brahîm e. Ji malbata wan re dibêjin "Mala Brahîmê Melê". Navê kalikê min (ji aliyê bavê min ve) Mele Mihemed, navê kalikê min (ji aliyê dayika min ve) Hecî Huseyn e. Lakîn di nava malê û der û dorê de em, bi navê dayika xwe tên naskirin. Ji bo wê yekê jî min re dibêjin "kurê Fatima Reşî". Wekî min, pîr mirovên kurd bi navê dayika xwe tên naskirin.

Ez mezin bûm. Em hatin Elihê (Batmanê), ez çûm dibistana tirkîyan ya pêşîn. Min xwend. Min dibistana navîn jî xelas kir. Ez çûm dibistana mamostetiyê. Min çar salan li bajarê Kirşehîrê xwend, di sala 1974-75'an de min dest bi mamostetiyê tirkîyan kir. Li bajarê Mêrdînê, qeza Mehseretê, li gundê Kudê min du salan mamostetî kir. Salek jî, li gundê Merzika derbas bû. Sala yekemîn, stajeriya min ranekirin. Du salan jî min li şûna leşkeriya tirkîyan, bi mamostetî kir. Piştî wê min îstifa xwe da.

Di sala 1976'an de min bi şoreşgerê mezin, Kawayê Hemdemî Mazlûm Doğan re têtikiliya siyasî danîbû. Di sala 1978'an de min dest bi xebata şoreşê kir. Taliya 79'an, em derbasî Sûriyeyê bûn? Li Lubnanê em çend mehan man. Di 1980'yî de ez vegeyriyam welat. Ez hatim girtin. 11 salan di zîndanê de mam. 8 sal li Zîdana Amedê, salekê li Ruhayê, ên din jî li Zîdana Ceyhanê derbas bûn.

Koçberî û rêwîtiya min; İzmir bû. Dîsa min berê xwe da Lubnanê. Ez çûm mala xwe yê mezin. Li vegeyriya ez hatim bajarê Stenbolê. Li ser neşriyat û çapemeniyê xebitîm. Li zîndanê êşa ziravî zirav (sîroz) bi min girtibû. Li Stenbolê ameliyat bûm. A nika ez li welatê Almaniyayê me. Ez di dora guhartina kezeba reş de me. Lakîn heta ku quwet di canê mirov de hebe; divê şoreşgeriya xwe pêk bîne. Bi kurtasî jiyana kurteçiroka min û danasîna min ev e. Eger ku min pîr dirêj kiribe biborin. Fermo hûn jî xwe bidin nasîn!..

Silavên germ ji we hemûyan re. Vê gavê bi xatirê we.

Piştigirî û têkoşîna du dayikan jî di vê filmê de xweş hatiye honandin. Her çiqas tarza jiyana her du dayikan jî hev cihê be jî, têkoşîna li hemberî zordariyê, wan nêzikî hev dike.

Ev demek e, filmeke bi navê "La-wê Dayikê" (Some Mother's Son-O da bir Ana) di sînemayên Stenbolê de tê nîşandayîn. Mijara vê filmê wê ji tu kesî re xerîb neyê her hal; greva birçibûnê ya girtiyên siyasî û têkoşîna dayikan a li derve.

Terry George û Jim Sheridan bi vê filmê, tewra zordar a hikûmeta îngilîz û jiyana mîltanên IRA'yê ya di girtîgehê de ku kûçik jî nikarin di wan şertan de bijîn, radixin ber çavan.

Li bakurê Îrlandayê destpêka sala 1980'an, hikûmeta îngilîz bi stratejiya ku ji sê merhaleyan pêk tê (tecrîtkirin, teşwîk-kirina sûc, bêmoralkirin), dixwaze "piştî IRA'yê bişkîne". Gelek kes tên girtin û tahde û zordariya li ser girtiyan jî berê zêdetir dibe û li gorî hikûmeta îngilîz li holê "şerek tune", "sûcdarê şer" tune, tenê "sûc" heye.

Ji ber vê yekê bi serîkîşandina Bobby Sands mîltanên IRA'yê li hemberî lixwekirina cilên "yek tîp" sala 1981'ê dikevin greva birçibûnê û dû re jî dizivîrin rojiya mirinê.

Lê ji ber ku hikûmeta îngilîz wan mîltanan mîna "terorîst" dihesibînin û "Leydiya hesinî" ya wê demê Margaret Teatcher jî diyar dike ku, "Dewlet bazarê nake", heta ku "dewlet bazarê dike" tevî Bobby Sands deh mîltanên IRA'yê can didin.

Tevî van yekan, piştigirî û têkoşîna du dayikan jî di vê filmê de xweş hati-

ye honandin. Her çiqas tarza jiyana her du dayikan jî hev cihê be jî, têkoşîna li hemberî zordariyê, wan nêzikî hev dike.

Di destpêkê de jî hatibû gotin ku mijara vê filmê wê ji tu kesî re xerîb neyê her hal, ji ber ku hê berî mehekê li Amedê 10 girtî bi destê tîmên taybet hatibûn qetilkirin, beriya wê bi du mehan jî ji girtîgehê cur bi cur 12 girtî di rojiya mirinê de can dabûn.

Tam di sala 1981'an de ku ev rojiya mirinê li Îrlandayê çêbûye, piştî saleke din (1982) li Amedê çar kes, piştî wê jî bi du salên din (1984) dîsa çar kes di rojiya mirinê de can dabûn. Dîsa jî ber eynî tewrî; "Dewlet bazarê nake!".

Li ku derê dinyayê dibe bila bibe, mantalîteya zordaran naguhere lê ji ber têkoşîna mafdar a bindestan, ew rojekê mecbûr dimînin ku mantalîteya xwe biguherînin.

Navê film: Some Mother's Son

Rejîsor: Terry George

Senaryo: Terry George, Jim Sheridan


Kamera: Geoffrey Simpson

Muzîk: Bill Whelan

Listîkvan: Helen Mirren, Fionnula Flanagan, Aidan Gillen, David O'Hara, Johnn Linch, Ciaran Hinds, Tom Hollander, Tim Woodward

1996, İngilistan (Özen Film)

AYNUR BOZKURT



Dermanê tirsê desthilanîn e

Wexta bibe êvar tuyê bidî dû wî û hûnê herin mal. Di rê de hûnê pêrgî şivan, gavan, rêwî bîn. Ew jî wê ji nêçîrvan bipirsin te çi ji nêçîrê anî. Ew jî wê sed derew û viran bike û wê bibêje ez gelekî beziyam û min bi zahmetî kêroşkek girt. Lê ya bi rastî yê beziyayî û westiyayî tu yî. Ê ku goşt bixwe û zirt û fortên xwe bike jî, nêçîrvan e.

Carekê nêçîrvan tajiye xwe da tengala xwe û derket nêçîra kêroşkan. Çûn çolê kêroşkek ji ber wan rabû û reviya. Dema taji kêroşk dît, wî jî da dû. Kêroşk çiqasî reviya, taji jî dû vegeriya. Êdî wê baş fêm kir ku, bi revê ji destê tajiye fireş xelas nabe.

Kêroşka tirsonek ku bi salan ji ber tajiyan reviyê, ji xwe re got:

– Dermanê tirsê desthilanîn e.

Hema ji nişkê ve li taji vegeriya, bi hêrs li nav çavên taji nihêrî û jê re got:

– Taji, ev qas reva ku ez dikim, ev qas ked û cehda min tev ji bo xwexelaskirina ji destê te ye. Lê tiştê ku ez fêm nakim, ez ji bo xwe direvim, gelo tu ji bo kê direvî?

Dema taji ev cesareta kêroşkê dît û ev gotin jê bihist, serê xwe berda ber xwe, guhên wî sist bûn, nema dizanî wê çi bersivê bide kêroşkê û di cihê xwe de sekînî.

Kêroşkê dom kir û got:

– Ger min zanibûya ku tu vê revê ji bo xwe dikî, min tiştê ji te re nedigot. Lê te xwe firotiye nêçîrvan, ji bo çar hestiyê bi herî.

Emê wiha bibêjin te ez girtim. Tuyê min bibî cem nêçîrvan, ewê jî min serjê bike û wê min bixe tûrikê xwe. Wexta bibe êvar tuyê bidî dû wî û hûnê herin malê. Di rê de hûnê pêrgî şivan, gavan, rêwiyar bîn.

Ew jî wê ji nêçîrvan bipirsin “Te çi ji nêçîrê anî?” Ew jî wê sed derew û viran bike û wê bibêje: ‘Ez gelekî beziyam û min bi zahmetî kêroşkek girt.’

Lê ya bi rastî, yê beziyayî û westiyayî tu yî. Ê ku goşt bixwe û zirt û fortên xwe bike jî, nêçîrvan e.

Dema ku hûn herin malê wê nêçîrvan bangî heval û hogirên xwe bike û êvarî wê goştê min bixwin, li devê derî wê te ji bîr bikin. Piştî ku xwarina xwe bixwin hestiyên min ên ku ji ber wan mane, wê wan bînin li devê derî biavêjin nava heriyê. Tuyê jî wan hestiyar ji nava heriyê derxî û yek bi yek wan bikevêjî. Çima ku tu xwe difiroşî û tu çima dijminê qewmê xwe yî?

Wexta taji ev gotin bihistin, hema serê xwe berda ber xwe û kolî poşman bi ser nêçîrvan de vegeriya, hat cem nêçîrvan û got:

– Nêçîrvan bi sed salan min dijminatîya qewmê xwe kiriye, min timî kêroşk girtine û te jî goşt dixwar hestî didan min. Ji îro û pê ve ezê nêçîrê ji bo xwe bikim.

Nêçîrvan tiving dixwe serê taji û mêjiyê wî belav dike û nêçîrvan wiha dibêje:

– Ev sed sal e tu bi kêrî min dihatî, niha jî tu nema bi kêrî min tîyî, ji ber vê yekê jî mafê te û jiyane tu ne ye.

BERHEVKAR: ABBAS ALKAN

Biratiya kûsî û rovî

Birayê rovî, te qala ava tofanê kir dilê min şewitî, di wê çaxê de kurekî min hebû. Ew jî mîna te xort bû, simbêlên wî stûr bûn, xortekî hêja bû, di ava tofanê de xeniqî. Hate bîra min dilê min şewitî, loma ez giriyam.

Kûsî û rovî destê xwe dan hev û bûn bira. Hevaltiya wan pir berdeyam kir. Dixwestin bi hev re çandinekê bikin, ji bo ku pê îdareya xwe ya zivistanê bikin. Her du bi hev re difikirin, dibêjin:

– Emê zeviyêke genim biçînin.

Qerara xwe didin. Dest bi çandina zeviyêke dikin, genimê wan hêşin dibe, tê wexta çinîne û her du bi hev re didirûn (diçinîn).

Hinekî didine ser hev. Rovî dixwaze ku fenekê li hevalê xwe bike. Difikire dibêje:

– Ez çi bînim serê kûsî, ku ev genimê hanê ji min re bimîne.

Gazî hevalê xwe dike û dibêje:

– Were vir?

Kûsî tê balê, dibêje:

– Çi ye birayê rovî?

Rovî dibêje:

– Emê vî genimê hanê çawa parve bikin.

Kûsî dibêje:

– Tu jî dizanî nivê min, nivê te ye.

Rovî dibêje:

– Na, em wisa par nakin. Were navbera min û te de emê şertekî deynin. Ji min û te kê me dereweke mezin kir, bila ew genim ji wî re be.

Kûsî dibêje:

– Baş e. Rovî, pêşî dora te ye.”

Rovî guhê xwe mûç dike, dêla xwe rast dike, qirika xwe paqij dike û dibêje:

– Birayê kûsî, tu zanî di wexta qal û belayê de ava tofanê rabû, wê çaxê ez xort bûm, min simbêlên xwe ba didan. Ez peyayekî gelek li ser xwe bûm.

Wexta ku rovî vê dibêje, ji çavê kûsî hêstirên hûr dibarin, tèn xwarê. Rovî bala xwe dide kûsî, di dilê xwe de gelek şad dibe. Dibêje: ‘Teqez, ev genim ji kûsî çû, loma kûsî digirî.’

Ji kûsî dipirse, dibêje:

– Ya birayê kûsî tu çima digirî?

Kûsî dibêje:

– Bira, derdê min giran e, qet behs neke.

Rovî dîsa jê dipirse, dibêje:

– Ji ber çi birayê kûsî?

Kûsî dibêje:

– Birayê rovî, te qala ava tofanê kir dilê min şewitî, di wê çaxê de kurekî min hebû. Ew jî mîna te xort bû, simbêlên wî stûr bûn, xortekî hêja bû, di ava tofanê de xeniqî.

Hate bîra min dilê min şewitî, lewma ez giriyam.

Gelek bêhna rovî teng dibe, di ser kûsî de dike qîrîn dibêje:

– Min di qermê stûyê te de nizam çi kiro, min zanibû tu yê niha nîn î.

Genim ji kûsî re dimîne û biratiya wan jî xelas dibe.

ALÎ ASLAN/ GIRTÎGEHA ERDEMLÎ



Sîpan û Jînê

Konê-Reş ku ji Başûrê Biçûk e, digel nivîskariya xwe bi nivîsîna helbestên xwe jî tê nasîn. Ev pirtûka di destê me de ye bi navê "Sîpan û Jînê" di sala 1993'yan de li Bêrûda Lubnanê hatiye çapkirin. Ji ber ku navê weşanxaneyê nehatiye nivîsîn, mirov dikare bibêje ku helbestvan bi xwe ev pirtûk çap kiriye.

Ebatên pirtûkê 16. 5 X 11.5 e û 55 rûpel e. Tê de 11 helbestên zarokan hene. Ji bilî du helbestan (Rêber Celadet û Masîko) ên din di kovar û rojnameyên têvel de hatine weşandin. Ji aliyê din ve, pirtûka bi navê "Sîpan û Jînê" bi wêneyên Xoşnav hatiye xemilandin. Di berga dawîn de jî helbesta Dîlawerê Zengî ya bi navê "Srûda Elfabê" heye.

Di Nûdemê de nîqaşa li ser întelektueliyê

Kovara Nûdem a demsalî yanê ya ku ji sê mehan carekê li Stockholmê derdikeve, di hejmara xwe ya dawîn de rûpelên xwe ji vê mijarê re veqetandine; întelektuelî û di nav gelê kurd de berpirsiya întelektuelan.


Ev demek e bi riya weşanên kurdî; çî di MED-TV'yê de be, çî di rojname û kovaran de bin, li ser mijara întelektueliyê munaqêşe tê kirin. Kovara Nûdem jî yek ji wan weşanan e. Kovara Nûdem ya demsalî yanê ya ku ji sê mehan carekê li Stockholmê derdikeve, di hejmara xwe ya dawîn de (hej.19, Payiz 1996), rûpelên xwe ji vê mijarê re veqetandine; întelektuelî û di nav gelê kurd de berpirsiya întelektuelan.

Di destpêkê de Xwedî û Berpirsiyarê Giştî yê Nûdemê Firat Cewerî, bi sernavê "Întellektueliya kurdî" ku ji sernavê jî tê fêmkirin, li ser taybetiya întelektuelên kurd disekine. Her wiha di întelektueliya kurdî de rola Bedirxaniyan, berpirsiyariya întelektuelên kurdan, kêmbêrbûn û fedekariya wan û hwd. bi firehî disekine.

Rojan Hazim jî bi sernavê "Ronakbîr û ronakbîrî", pêşî peyva "rewşenbîr" jî hev vedike û dibêje: "Di farisî da 'Roşenfikir' tete gotin. 'Roşenfikir' tekabulî 'Ronakbîr' dike. Lê ev 'Rewşenbîr' manayê nade û xelet e. (...) Di bingehî da, 'Rewşen' forma xirabbûyî ya 'Roşen'ê ye. Lewma divê ev bêjeya 'Rewşenbîr' bête terk kirin..."

Îcar divê ev bête gotin, mimkûn e gelek peyv ji zimanekî derbasî zimanên din bibin, hem jî bi awayekî xwezayî. Ji ber têkiliya gelan rê jî hev standina peyvan re her tim vekirîye. Tu kes nikare îdia bike ku her ziman xwerûtiya xwe heta hetayî diparêze û tu danûstandin di navbera zimanan de çênabe. Lê dîsa jî xwezî bi xwerûtiya zimanan...

Piştî vê tehlîla li gorî xwe, birêz Hazim erkên ronakbîriyê û her wiha yên kurdan bi berfirehî tîne ziman dinvîsa xwe de.



Dîsa Şahinê Bekirê Soreklî bi sernavê "Întellektuel û întellektuelîzm", Edip Polat "Întelligent- întelijansiya, întellektuelî", Derwêş M. Ferho "Rola rewşenbîriyê di rêkxistinên kurdî de", Cemşîd Bender "Pirsgirêka întellektueliya kurdî" (ji tirkî hatiye wergerandin), Şerefxan Cizîrî "Rewşenbîrên politîka", Medenî Ferho "Bêdengî mirina rewşenbîran e", Riza Polat jî bi sernavê "Întellektuel" li ser vê mijarê dîrûdirêj sekinîne.

Digel vê yekê di vê hejmara kovarê de cih ji çîrok, helbest û nivîsarên lêkolînî re jî hatiye veqetandin.

NUR-HAYAT

Zimanê peyvan

MAHZHAR GÛNBAT



Ziman bi giştî jî peyvan, sembolan û honandinan wan pêk tê. Bi tarîfeke kurt ziman peyvşazî an jî sembolsazî ye. Li aliyê din çawa peyvên zimên hebin, her wiha zimanê peyvan jî heye. Ji bo ku mirov vê yekê bibîne divê hinekî bi wan re bileyize, jîmnastîkê bike.

Ez dixwazim du peyvan bikim mēvanên vê nivîsê û li devê wan bigerim. Mēvanên me "rewş" û "hal" in.

Di nav kurdan de peyva rewş bi giranî di van salên dawîn de kete warê bikaranînê, pir jî zû belav dibe. Gotinên hene tu bikî nekî, nikarî wan bi civakê bidî ecibandin. Tevî vê yekê kēfa gel jî "rewş"ê re hat, wisa hat ku carina wê mîna bêjeyêke joker bi kar tîne. Heta van pêlên dawî jî, di şûna wê de "hal" hebû. Hal erebî ye, di zimanên ewrûpiyan de rûberên wê etat, state, staat û hwd. in. Ev bêjeyên Ewrûpî tēn wateya "dewlet"ê jî. Di navbera "rewş" û "dewlet"ê de tēkilî an jî lêzimiyek xuya dike. Wekî ku hebûna yekê bi ya din ve girêdayî be.

Tirkan, heta ku komara xwe danemezirandibûn, ji bo rewşê digotin "hal" dū re peyvçêk-

erên wan gotina "durum" afirand, tevî vê yekê wan wateya dewletê li "durum" bar nekîr, ji bo dewletê jî ku peyveke erebî ye gotineke nû di tirkî de cih negirt.

Berê, halê me û yê tirkan dişibiyên hev. Di nav împaratoriya Osmanî de halê kesî ne tu hal bû; ne durum hebû, ne jî rewş. Piştî hilweşîna împaratoriya û avabûna Komara Tirk, "hal"ê wan hinek jî bi zora peyvçêkerên nûparêz cihê xwe da "durum"ê, lê mixabin di "hal"ê de tu guherîn çênebû û xerabtir jî bû.

Îro jî li gelek deverên Kurdistanê tevî pêldan û geşbûna "rewş"ê hê jî hal jî zimanê me nehatiye avêtin. Wî di gelek biwêj û gotinên pêşyan de jî çarmêrgî vedaye, wekî: "Halê me ne tu hal e, ez bêhal im, gunehê kûçikan (kafirên) bi halê wî tē, Xwedî li halê te bipirse, xwezî ne bi halê te, ji halê xwe re digirî, kenê xwe bi halê me dîke û hwd." Di van biwêjan de tiştê bala me dikişîne, halê wan ê xerab e, maneya wan a neyînî ye.

Dibe ku di kurdî de hejmarek biwêjên xweş "hal" jî hebin, lê belê, li ber yên reş 'hal' gelek hindik in. Tevî vê yekê, di demên dawî de rewşê destê xwe xistiye xeneqa hal û wekî ku jê re bibêje: "Here, va ez hatim. Tu bîmîni jî ji nav biwêjên bedbîn dernekeve."

Hal peyveke nêr e (halê me yê berê). Nêr di maneya cînsî de mêr e. Mêr, mirov û mirin bi hev re eleqedar in. Hal pir nêzikî mirinê ye. Rengê mirinê mor e, kincê rengetarî û şêlo li hal hatine kirin. Rengê wî jî mor dibe. Ji rengê wî nezani, tirs, xizani, nexweşî û tevlihevî dihenike.

Rewş peyveke mê ye (rewşa me ya îro), di wateya cînsî de jin û remza bereketê ye. Jêderka

jin, jin û jiyane yek e. Jiyane rengê kesk û hêşin e. Ew di rengê giya û ezman de ye. Ev reng zanîn, hêvî, zelalî, evîn û serûberiyê didin xuyakirin. Hal çawa bi rengê mirinê yê mor û şêlo çilmsî be, ji rewşê jî ewçend tîrêjên rengên jiyane û xwezahê diçirsin.

Nizanim tu cîraniya rewşê û bi rewşenê re heye an na, nebe jî ez dixwazim wan bigihînim hev. Wekî din min dil heye wê bi rojê re jî bikim lêzim. Bi min rewşen diya rewşê û keça rojê ye. Hêvî dikim ku reş bi tesadûfî dişibe rewşê, an jî ji bo komployekê xwe nêzikî rewşê dike. Emê bera reş bidin, bila here bi halê xwe ve.

Rewş li destpêkê di rengên av û ezman de ye; berevajiyê şêlobûna hal, ew sahtî û zelal e. Ev rengên bi xwe bawer, dawî vediguherin kesk û hêşin, rengên hêvî û vejînê. Rewş niha di temenê rengên destpêkê de ye; ew dikare rûne û li derdora xwe bimêzîne, bi destê xwe cihê xwe xweş bike. Car caran li xwe dide radiibe ser xwe ji bo rengê xwe yê xwezahî bistîne.

Rojê gelek bêriya rewşê kiriye. Ew li hêviyê ye ku rewşen wî ya dawî bi şîr û şekir xwedî bike, binêz bike; da ku here rojê, ji wî halê reş ê bi mij û moranên tarî rizgar bike û rengê birnên wê bi av û giya bikewîne.

Di zimanê ewrûpiyan de state, staat, etat di şûna dewletê de tēn bikaranîn, ew her wiha tēn maneya rewşê jî. Berê em xwedî halekî xerab bûn, niha êdî em jî dibin xwedî rewş.

Di navbera rewş û dewletê de tēkiliyek xuya dike; başbûn û xurtbûna rewşê li pey xwe dewletê tîne. Kēfa kurdan jî peyva rewşê re gelek hat. Hûn dibêjin çî, em wê di şûna dewletê de dikarin bi

Pîrek û serokê cehşan

Waxtê hîlbijartindê giştî de cahşî yenê jû dew de Çêrmûg. Hemû cenîyan, camêrdan û domanan arêkenê pêser.

Serokê cehşan vejyeno jû êraba ser û qisey keno.

Vano:

- Nezdî de yew hîlbijartin esto, ezo wazena şîma raya xo xayinan terorîstan û ermenîyan medê. Raya xo bidê partîda ma (MHP); partiya ma partiya dewlet a. Qandê coya şîma raya xo bidê ma.

Dewijan miyan ra jû pîrek vejyana û vana:

- Nameye partîda şîma çiç yo? Ablemê ci senîn o? Serokê cahşan vano:

- Nameyê partîda ma MHP wo. Ablemê ci jî kaxitê ki embazê mayê kenê vila, înan de esto." Pîrek ewnena kaxit çiçi bi-wîno, jû kişt 3'ê aşmî jû kiştî kutiko reş. Pîrek fina vana:

- Şîma nameyê nay çewt navo pa?

Serokê cehşan vano:

Çira?

Pîrek vana:

- Na kaxit sero fotografê kutikê reşî esto. Amblem şîma gore wo, la belê nameyê partî şîma gore niyo. Serokê cehşan: Vano senî. Pîrek amblem kutiko reso. Kutiko reş har beno. Şîmajî, zenê kutiko har. La belê sermîyanê dewleta



tirk jî şîmara cêr nêmanenê, qandê coya. No name rind... niyo. Mi cirê namevo vind diyo. Serokê cehşan:

- Xalê çiç yo, vaj eger ma gore beno se, ma jî ê namey nam partîda xo ya.

Pîrek:

- Ezo wazena ke namey cî partiya kutikan dê reşan bo. No name heyevna rind o. Pîrek senî wîna vatîştî, cehş vano

- Tiya se vana ma kutikîm?

Pîrek:

- Şîma kutikî niye se, no kutiko çiçi geyreno?

Cehş:

- Xalê o kutiko reş niyo. O bozkurt o. Xalês jî xo miyande vana:

- No fotoğrafo ke kaxit sero heveyê, vergê gewrî maneno. Labelê şîma û pilê dewlet bê kutikê reşî tevay nemanenê.

MEMED DIREWŞ

Ez dizanim

kezeba kê dişewit

Mirovek rojekê bi peyva diçû bajêr, rîya wî gelêkî dirêj bû. Ew mirovê rê de birçî dibe, dihere li gundê kî dibe mêvan, li mala yek dewlemend rûdine û ji wan dibêje:

"Ez birçî me."

Lê xwediyê malê gelekî timarê ye, nikare nan bide kesî. Pîrek malê, bes nanek û nîv tas dima şîrîn datîne ser sifreyê. Lê pîrka malê ji xwe re wiha dibêje:

"Bi Xwedê ez kevçî jê nîv naynim, ger ez bînim wê ji dima pir vexwe. Bila nanê xwe dima de bike ku hindik bixwe."

Sifre ji mêvan re datîne, mêvan nanê xwe xelas dîke û li dîwiyê radihêje tasa dima, ji bo kî vexwe. Hema pîrka malê di ci de deng li mêvan dîke û dibêje:

"Keko, keko tu dikî dima vexwî, wê kezeba te bişewit ne."

"Na xwişka min, ez dizanim kezeba kê dişewite", dibêje mêvan û dima bi ser xwe de dikê dilê xwe rihet dîke.

MIHEMMED MUHAMMEDI

BIXELAT...

XAÇEPIRSA BIXELAT (39)

XAÇEPIRSA

S	E	B	R	I	B	O	T	A	N	I
R	E	E	L	S	O	R	A	N		
S	E	L	M	A	N	M	A	M		
M	A	N	G	E	A	T	I	N	A	
A	V	E	L	B	K					
A	S	K	J	I						
A	N	D	M	E	R	I				

PEYVA VEŞARÎ → DEMOKRASÎ

Bersiva Xaçepirsa 37'an

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi rîya pişkê li 10 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 39'an kasete Agirê Jiyan "ADARÊ" ye. Jêrenot:


Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.



Kesên ku xelata xaçepirsa 37'an, kasete ŞIYAR "SAZBENDO" qezenc kirine: Jiyan Ronîzêr/ Batman, Üzeyir Ağırman/ İzmir, Hüseyin Kınağû/ Bayrampaşa, Medine Akboğça/ Gebze, Helin Doğan/ İskenderun, Sedat Akbulut/ İzmir, Dilber Vehaç/ İzmir, Vefik Kaplan/ Bartın, Sunay Seziz/ Wan, Baran Berk Selçuk/ İskenderun

Jina ku teşî dirêse	Rewrewk	Stêr	Reh, kok	Gihanekek	Navekî mêran
Şairek (wêne)	Heywan	Eslî		Namerd	
		5			Sazûmaneke leşkerî
Amojgarî, nesîhat			Nanîkê hîngiv	4	
Polîtîka			Jî hev belavbûyî		
	2			Hevraz	1
				Qanûnî	
Bî soranî (Rêberî)				3	
Ava					
		Çiyayek li devera Behdînan	Zemberek		
Kûçîk			Hêlîna teyran	7	
Oksîjen			Sebzeyek		
	Baneşanek		Qertafa pîrsê		
	Surwe		Xwendîna tîpekê		
Anarşîst (bî soranî)	6			8	
Helî kirin					

PEYVA VEŞARÎ →



DÛPIK

* Li başûr dîsa aftî qêbû...

DE MERN
ÎFÊ XWE!
ÎCA AFTÎ..TEEW
!..



Dewletê xwe hetikand

Dozger Nuh Mete Yüksel pêşî xwêdan da, paşê xwe ji bîr kir û li hemberî strana Şivan "Leyla" tempo girt, bi dizî destê xwe li gorî ritma muzîkê li kursiyê da. Li dadgehê sloganên wekî, "Bijî Serok Apo", "Bijî PKK", "Gerila vuruyor Kürdistanı kuruyor" bilind dibûn.



kasetê, heyeta mehkemeyê gelekî tengav bû. Heyetê jî bawer kir ku tu tîkiliya HADEP'ê bi daxistina alê nîn e. Lewre du endamên diwanê hatin berdan.

Di vê danişînê de tiştê herî balkêş, nişandana kasetê kongreyê bû. Di dadgehê de axaftina bi kurdî hatibû qedexekirin, gelek ji ber bi kurdî peyivîbûn hatibûn cezakirin. Lê di kasetê de gelek axaftin, stran û sloganên bi kurdî hebûn, hêm jî yên herî tûj ku dozger aciz dikir. Ew giş ji hêla heyetê, girtiyên, malbatên girtiyên, parêzer û rojnamevanan ve hatin temaşekirin. Slogana dadgehê êdî dişibî salona sînemayê. Malbat, parêzer û rojnamevan bi dizî li hemberî stranên Koma Amed, strana Şivan Perwer "Leyla" tempo digirtin.

Dozger Nuh Mete Yüksel pêşî xwêdan da, paşê xwe ji bîr kir û li hemberî strana Şivan "Leyla" tempo girt, bi dizî destê xwe li gorî ritma muzîkê li kursiyê da. Li dadgehê sloganên wekî, "Bijî Serok Apo", "Bijî PKK", "Gerila vuruyor Kürdistanı kuruyor" bilind dibûn. Bi kêmasî 5-6 axaftinên bi kurdî derketin, posterên Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan, alên PKK hatin nişandayîn.

Rojnamevanên tirkên li hemberî rewşê heyirî man û hinekan ji wan bi henekî gotin: "Dozger û dadger propagandaya PKK'ê di-kin, pêwîst e der barê wan de jî doz were vekirin. Li dadgehê çî qedexê bû ew hatin nişandayîn, hem jî bi destê dozger û dadgerê DGM'ê ve.

ORHAN QIRŞIK

WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN YÖYLER

NAVNİŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerinendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê
(Yayın Kurulu)
AYNUR BOZKURT
SAMİ TAN
RAHMİ BATUR

Berpîrsê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziyê
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)
Nimînendeyê Giştî
yê Ewropayê:
Mazhar Günbat
Suriye: Jan Dost
Helim Yûsiv
963-21-960099

Berlin:
Silêman Sîdo
49-30-69002695

Hannover:
Selîm Biçûk
49-5721-81360

Munchen:
Mahmut Gergerli
49-871-670884

Bruksel:
Medenî Ferho
32-02-466037

Stockholm:
Robîn Rewşen
46-8-7510564

Bonn:
Ahmet Baraçalıç
49 228 66 62 49

Celle:
Wezir Saçık
49 50 52 87 36

Dêrsim kula reş e Di ser dil

“Ev du sal derbas bûn ku ambargoyeke barbar li ser
însanên vir wekî şûrê felekê rawdişê (diheje).
Birçîti bû wekî qedera wan. Lê tiştê ji destê min jî nehat, we
jî tu tiştê nekir, ji bo wan... Îcar hûn gere dest deynin ser
vê yekê û bi kêmanî her havîn werin mala xwe û
li welatê xwe xwedî derkevin.”

di nav kincên xwe yên reş
de êvar hat û li ser balgiyê
min rûnişt. Ji min re “Ka tu
bi xêr hatî, ev gelek wext e
ku tu nehatibûyî welatê
xwe. Gelo te çawa dît?”,

got. Min, bi xemgîniya xwe jê re got:

“Dev ji min ber de, jixwe moralê min
niha ne li cih e.” Ji ber vê qeherîna min,
şevê tariya xwe bi xwe re bir û çû; di
şûnda wê de, ezman sayî bû û dengê ji
kûrahiyê hate min, ji min re “Ha lawo!
Ma tu li van deran li çi digerî? Te çi yê
xwe wînda kiriye?”, got. Ez ji vê yekê re
şaş bûm û gelek jî qeherim. Min li derdora
xwe nihêrt ku tu kes nîn e. Lê, ew
deng bû. Gelo ev ji ku dihat û dengê kê
bû? Ku min jê re bersiv neda, dîsa ew
deng derket û pîrsa xwe ji nû ve ji min
kir. Êdî ji ber neçarî min bersiv wekî pîrs
da: “Ka tu kî yî?”

Got: “Ez ezmanê we me, ezmanê he-
rêma Dêrsimê!”

Ez dîsa şaş bûm, bi zanîna min, ez-
mên tu car xeber nedida. Lê her hal şik
bir ku ez wisa difikirim, ji min re got:
“Lawo tu çi insanekî bêaqil î; ma tu ni-
zanî ku ez bûme şahidê bûyîn û mirina
ew qas insan û bûyeran ku, êdî tu tişt ji
min nayê veşartin.”

Îcar xofek kete dilê min û ez gelek tir-
siyam. Xelet neyê fêmkirin, tîrsa min ne
ji peyivîna ezman bû; ez tîrsiyam ku, he-
ke ku ezman her tişt dîtiye û bîhistiye,
nexwe wê ji her tiştê min ên taybet, ên
veşartî jî haydar be. Min êdî fedî (şerm)
kir. Ezman dîsa ji fikrê min fêmkir û qe-

riya ser min:

“Kuro ma tu çima ji hest û jiyana xwe
ya zarokî şerm dikî û bi ber xwe dikevi;
divê hûn kesên ji Dêrsimê ku li derveyî
welatê xwe ne, îro ji rewşa xwe şerm bi-
kin çêtir e.”


Min serê xwe xist ber xwe û min got:
“Çima tu wisa dibêji, ma me çi xeta kiri-
ye?”

Ezmên dengê xwe bilind kir û got:
“Ma ku hûn şerm nekin, ka kî bike?
Êdî xwîn kete kezêba min. Na, ha ev du
sal derbas bûn ku ambargoyeke barbar li
ser insanên vir wekî şûrê felekê rawdişê.
Birçîti bû wekî qedera wan, lê tiştê ji
destê min nehat, jixwe we jî tu tişt nekir.

Dîsa gelek gundên vir bi destê leşker
û hêzên fermî yên tirk hate valakirin û
şewitandin, we dîsa zêde tiştê nekir.
Koçberiyê dest pê kir. Gund, navçe û ba-
jar koç kir, we dîsa tiştê nekir. Ka ez ji
were bibêjim ku gelek insanên we yên
birûmet revandin û dû re jî dan kuştin,
dîsa jî li ser we tesîrek nekiriye! Êdî
hewce pê heye ku ez bibêjim zaroka ke-
çîn do ji min re çi gotibû?”

Min jê re di maneya “nizanim” de se-
rê xwe hejand. Ezmên dîsa deng da û
dest bi axaftinê kir:

“Ma hûn çi dizanin ku...? Haya we ji
bûyera Mezra Mîrikê heye ku heşt kes di
yek rojê de li ber çavên hev, bi îşkence-
yan, bi hovîti hatin qetilkirin? Dilek Işık,
wê demê sê salî bû. Berikên (qirşûn) leş-
kerên romî li ketin nav dil û gurçikên
wê, wê destê xwe dirêje min kir, lê ji ha-
wara wê re min nekaribû ku tiştê kî bi-



kim. Ew dengê wê, hîna wekî kula bê-
derman e û li ser dilê min e. Welhasil ew
jî, ji kesekî re nebû minak, bédengî ber-
devam e, dîsa partiyên xwînxwer derke-
tin holê û bi saya we hilbijartin bi hêsanî
qezenc kirin. Ji ber ku we tu alîkariyê
baş neda partiya gelê xwe. Hûn an çûn bi
du parî û keriyên ketin, an jî we bawerî-
ya xwe bi kemalîstan anî û ji nû ve hûn
bi alewîtiya xwe hesiyan; pişt re jî hûn
çûn ketin nav qirêjiya wan.

Ev bédengiya we û bêaqiliya we, her
tim belayêke mezin e û li ser serê we ye.
Kurmê darê ku ne ji darê be, tu tişt pê na-
yê. Heke ku hûn mirovên dêrsimî, an yê
derve an jî yên hundir, gava ku hûn ji dî-
roka xwe encameke baş derxînin, bi ya
min hûnê bikevin rewşêke baştir. Lê he-
ke ku wisa berdevam be, divê Dêrsima
xweşik tal (vala) bibe. Îcar hûn gere dest
deynin ser vê yekê û bi kêmanî her ha-
vîn werin mala xwe û li welatê xwe
xwedî derkevin.

Hûn gere fedî bikin ku birçîhiştin,
kuştin, malşewitandin, revandin û îşken-
ce, ambargo wekî bûyerên li dijî mirova-
hiye ne; divê kesê ku xwe insan dipejirî-
ne li dijî wê bisekine.”

Min serê xwe rakir û pîrsa zaroka ke-
çîn kir. Ezmên got: “Biborin. Min ji bîr
kir. Do zaroka keçîn li gundekî Mêzgirê

(Mazgirt) li ser şemuga deriyê derve, rû-
niştibû û digiriya; min jê pîrs kir:

“Keça min, ka tu ji bo çi ew qas ji dil
digirî?”

Got: “Ma ez çima negirîm? Ji ber ku
bavê min li dijî şewitandina mala me
derket û îtiraz kir, leşkeran bavê min
kuştin. Dû re jî diya min nexweş ket û
ew jî mir. Ez wê demê di dergûşê de
bûm. Gund, dema li ser vê yekê vala di-
be, dapîr û bapîrê min û çend pîr û kalên
din tenê li vir dimînin. Ez jî li cem wan
im. Nika, ji xeynî me, kesek nîn e. Ji min
re her tim dibêjin zarok. Ma zarokî çi
ye? Ji xeynî min kesekî wekî min ku za-
rok be heye gelo? Hevalekê min tune ye.
Ma ez çawa hedêr (sebr) bikim. Tenê
me, ma tu ezman î, ew qas ku mezin î, tu
çima alîkariya min nakî!”

Ez fikirim ku hemû gotinên wê rast
in, lê tu tişt ji destê min nayê. Divê hûn
vê alîkariyê bikin. Alîkarî ew e ku divê
hûn Dêrsima delal vala nekin, ji hev re
alîkariya xwe, têkilî û dan û standinên
xwe zêdetir bikin û insanetiya xwe bipa-
rêzin. Bi vî rengî ji hemû zagonên (qanû-
nên) xwînxwer û şerxwazan pûç û bête-
sîr bikin.”

Ez rabûm ji cihê xwe û bi dilekî şikes-
tî zivirîm hundir.

